Tıpkı çözüm sürecinin sonlandırılmasına gerekecek olarak gösterilen Ceylanpınar'da görev yapan iki polisin, gece yataklarında öldürülmesi gibi...

Cezasızlık kültürü

Cezasızlık, durmadan kendini yenileyen, alanını genişleten, döneme göre farklı renkler alan bir kültür. Bütün devletlerde farklı tonlarda ve ölçülerde kendini gösteren bu kültür anlamak için "ama" ve "fakat" cümlelerini takip etmek yeterli.

"Öldürüldü ama daha önce polise taş atmıştı", "Öldürüldü ama o saatte şüpheli bir yerde bulunuyordu", "Öldürüldü ama daha önce şu eyleme katılmıştı..."

Şiddet tekelini elinde bulunduran devletin kolluk kuvvetleri-

nin, toplumsal sözleşmeden, kanundan, kurallardan kendini muaf tutması olarak özetlenebilir.

Bazen kendini mahkemelerde, kapatılan savcılık dosyalarında gösterir, bazen bir cinayeti akılamak ve kamuoyunun cinayeti meşru bulması için yaptırılan bir haberde.

Algıyla güçlenir, meşruiyet alanları yaratarak büyür ve giderek herkesin bir gün kurbanı olabileceği bir deve dönüşür.

İşte ölümlerinden bahsettiğimiz,çoğunun ismini bile anımsamadığımız bu çocukların hesabı, cezasızlık kültürünün bu coğrafyada ölçüsüz biçimde alanını genişletmesi nedeniyle sorulamıyor.

Bu çocukların ismi, bu yüzden anılamıyor, yasaklı bu alana bu yüzden kimse giremiyor.

Kimine göre vatanperverlik olan bu tutumun sonucunda ise bütün cinayetlerin üzeri bayraklarla, sloganlarla örtülüüyor.


Çocuklar ve düşleri

Çocukluk hepimizin uzak ülkesi...

Kimin omzuna elinizi biraz koysanız ya çocukluğundaki bir yokluğun ya da çocukluğunla ilişkin bir mutluluğun cümleleri dökülmeye başlıyor dudaklarından.

Ancak bazı çocuklar ve çocukların muaf bundan.

Çocuk işçiler, esrarlı bir maceranın güler yüzlü yorgunuğuyla uyumuyorlar misal. Sokakta bırakılmış çocuklar, bir serin ikindiye sokağa çıkmaya hayali kurmuyorlar. Şiddet gören çocuklar, uymadan



önce odalarına gelen anne ya da babalarını istemiyorlar örneğin. İstismara uğrayanlar uzaktaki bir aşkın nasıl bir güneş getireceğini hayal etmiyorlar.

Ve ülkenin bazı kentlerinde, bazı ilçelerinde, bazı sokaklarında büyüyen çocuklar da büyüğünce ne olacağını değil büyümeyi hayal etmek zorunda kalıyorlar.

Ölebileceklerini biliyorlar, çocuk ölümü düşünür mü, düşünüyorkarlar.

Ve ülkenin bazı kentlerinde, bazı ilçelerinde, bazı sokaklarında büyüyen çocuklar da büyüğünce ne olacağını değil büyümeyi hayal etmek zorunda kalıyorlar. Ölebileceklerini biliyorlar, çocuk ölümü düşünür mü, düşünüyorkarlar. Şiddetten uzak durmanın ne olduğunu bilmeyorlar; kaçmayı, uzaklaşmayı biliyorlar.

Şiddetten uzak durmanın ne olduğunu bilmiyorlar; kaçmayı, uzaklaşmayı biliyorlar.

Seslerin ürkütüçülüğünü değil, hangi seslerin daha ürkütücü olabileceğini ayırabiliyorlar birbirinden.

Ölüyorlar, yaralıyorlar, unutamayacakları anılar biriktirmek yerine o sahneleri akıllarından çıkarmak için bir ömür harcıyorlar. Ya da ömürleri harcanıp gidiyor demek daha doğru.

Hemen itiraz cümleleri gelecektir, çocuklar ve çocukluk üzerine:

"Büyüseleri kim bilir ne olacaktı?", "Hiç örgütün öldürdüklerinden bahsetmiyorsunuz?"

Fırat Simpil'den de bahsedilmesi gerekiyor evet, PKK'nın mayınladığı sokakta, ekmek almaya giderken ölen 13 yaşındaki çocuktan.

Lojmanın önündeki kediyi beslemek için dışarı çıkan 11 yaşındaki Ahmet Oktay Günak'ın bombaların hedefi olmasından.

Her birinden bahsetmek gerek. Hiçbir şeyin tarafı olmadıkları halde, babalarının, annelerinin mesleklerine göre ölümleri kıymetlendirilen, doğdukları kente göre tarafı olmadıkları çatışmaların tarafı kılınan, yaşadıkları coğrafyaya göre varlıklarını ya da yoklukları anlamlandırılan...

Çocuklar.

Ve geçiremedikleri çocukluk, bütün bu karmaşanın içinde...

Onları erkenden büyütlen ve tüm bu karanlığın içinde her birimizi aslında içten içe bitiren... ↘

Sê Pêtik

sê pêtik çûrisîn di taritiyê de

yet

bo bêhiş bikevim li hêlekana mîracâ porrê te
yet

bo awirêñ xwe biferidînim şevçiraxa bîbikêñ te
yet jî

bo kêlekêñ lêvên te...

û tarîtiyek bêdawî dara dilî
ji bo ku bizîvirim dîsa li her tiştî
dema min her stêrk kire kulîlkek
û li ser porrê te danî

Miradê Miradan

► LI SER SİNEMAYA KURDAN - I

MIRADÊ MIRADAN




Ji roja keşkirina sînematoografiyê û yekem filmê ku Brayên Lumîerea li stasyonekê girtine ve sînema îfadeya hîzr û hestêni mirovan e. Gelek xelk û milet bi saya serê sînemayê derd û kulên xwe; dîtin û gotinên xwe ji çar aliye cihanê re vegotine. Kef û eşq û şer û fantaziya di hiş û dilê meriv de bi destê kamerayê wek hunereke serkeftî û nikûnû û jêveneger bi navê "sînemayê" derketiye holê.

Gava em berê xwe didine nav kurdan û dibêjin sînemaya kurdan mixabin ku ji bêdewletî û parçebûn-tarûmarî sînemayek serbixwe ava nebûye. Kurd di serî de weke "mijar" ango "karekter" di filmên derhenêrên biyan de bi sînemayê re hevdû nasîne. Hola sinemayê ya pêşîn di sala 1926an li bajarê Silêmaniyê vebûye; teqrîben di vê dîrokê de holeke sînemayê li Amedê ji vebûye. Li Rojhilatavîn welatên ku kurd lê dijîn derhênerên kurd di bin navê wî welatî de film hilberandine.

Lewra mixabin em nikarin behsa sînemayeke netewî ya yekbûyî bikin; çiku wekî axa kurdan, sînemaya kurdan ji wesle wesle ye...

Kurd û sînema

Ji ber tahdayî û asîmîlasyona dewletên serdest heta salên 1990î ji baş derfet nebûye ku bi kurdî film bêne çekirin û derhênerên kurd azad tevbigerin. Lê iro ji wilo ye ku ci li Tirkîyeyê, ci li İranê ji bo çekirin, belavkirin û seyrkirina filmên



kurdî qedexe têne dayîn û di
beşdarbûna wan a festîvalên
filman de astengî çêdibin û
fon nayêن dayîn. Mixabin heta
vêga jî li Tirkîyeyê filmên bi
kurdî ewqas kêm têne çêkirin
ku weku qet nînin. Derhênerên
kurd ên heyî jî bi zîmanê tirkî
filmên xwe çêdikin/çêkirine...
Lî Îranê heta demeke dirêj ji bo
derhênerê kurd Behmen Quba-
dî, ku filmên xwe bi kurdî digire,
qedexeya çêkirina filman ha-
tiye dayîn; lew neçar maye ku
welatê xwe biterikîne. Her wiha
weke Qubadî derhênerê navdar
ê kurd Hiner Saleem jî li Fran-
sayê dijî û ji bêderfetî filmên
xwe yên ewil li wir çêkirine ku
vê taliyê berê xwe daye başûrê
Kurdistanê.

Li Tirkîyeyê heyama ewil bi
destê Yilmaz Guney, kurd
bi awayekî eşkere û cidî di
sînemayê de derdikevine pêş.
Beriya Guney heke kurd di

sînemaya tirkî de hebin jî bi
awayekî xef û veşartî erdnigarî
û nasnameya kurdî hatiye
bikaranîn ango wek "tirkê bi
esil kurd" hatine nîgar kirin.
Derhênerên wek Atif Yilmaz(-
kurdê Elezîzê ye lê ev zêde
nayê zanîn), Omer Lutfu Akad,
Memuh Un hwd. ev yek di
filmên xwe de kirine. Senar-
yoza filmên wan jî gelemerî
li herêma Anadolê çîrokên
Yaşar Kemal û Ezîz Nesîn
bûne. Lê filmê derhênerê tirk
Erden Kiral "Demsalek Li Co-
lemergê(1982)" ku ji romana
bi heman navî ya Ferîd Edgû
hatiye lêanîn di heyama hingê
de ji bo tarîf û nasîna gelê
kurd nimûneyeke baş bûye.
Kiran di vî filmê xwe de, bi çavê
mamosteyekî tirk bi awayek
rasttirîn nêzîkî erdnîgarî û jiya-
na kurdên li Colemêrgê bûye; ji
derhênerên din cihê xwestiye
ku kurdan binase.

Yilmaz Guney nemaze bi
filmên xwe yên "Kerî(1979)" û
"Rê(1982)" berê xwe dide jiýin,
civak û nasnameya (ango bê-
nasnameti) kurdan. Her cîqas
ji ber qedexeyê li ser zimanê
kurdî, bi tirkî hatibin girtin jî ev
film bi navêن kurdî yê karakte-
ran, bi muzîk û diyalogên kurdî
ji karêن Guney ên berî hingê
cihê ne. Ji van filman eyan e ku
Guney bo avakirina "Sînemaya
Kurdan" gavêن cidî avêtine û
êdî xwe weke derhênerê kurd
tarîf dike. Guney, rastiya kurdan
bi êş û xetereyêن xwe bi nêrî-
neke realist-politîk-dramatîk
vegotiye. Girîngî û yektabûna
filmê "Rê" di festivala filman
a Cannesê de bi "Palmiyeya
Zêrin" tê xelat kirin ku heta wê
demê li Tirkîyeyê ti filmî ev xelat
wernegirtibû. Ji ber ku Yilmaz
Guney wê demê girtibû derhê-
neriya vî filmî heval û hevkare
wî Şerîf Gonen kiriye. Piştî Yil-


maz Guney heta demeke dirêj di bin banê "Sînemaya Kurdan" de film nayêن çêkirin, heta ku di sala 1992yan Nizamettin Ariç filmê "Kilamek Bo Beko" çêdike ku komkujiya Helebçeyê ji xwe re dike mijar. Salekê piştî vê di Festîvala Filman a Bastîayê ya 9. de xelatê hildigire. Filmê Ariç yekem filmê xwerû bi kurdî ya bi metraja dirêj e. Heman salan li Tirkiyeyê ji filmên li ser kurdan tê çekirin. Ev film ji folklorâ kurdan, ji aliyê derhênerên kurd ve lê bi zimanê tirkî hatine çêkirin. Filmê "Mem û Zîn(1991)" ê Umît Elçi, filmê "Sîyabend Û Xecê(1993)" yê Şahîn Gok ji bo vê yekê mînak in.

Lî Iranê, hunermendê bi eslê xwe kurd Ebdulhuseyîn Spenta di sala 1934an de filmê "Keça Lor" çêdike. Piştre ji huner-mend Siyamek Yasemî filmê "Lêvara Hêviyê" û "Dalahû" çêdike ku behsa jiyana kurdêن

Loristanê dike. Yekem derherê kurd li Iranê Teymûr Patayî bûye. Patayî di sala 1970î de dest bi karên sînema û TVyê kiriye. Teymûr Patayî, kurdê Ro-jhilat ê bajarê Sinê ye. Patayî di sala 1984an çend belgefîlman ji çêdike ku yek ji wan filmê bi kurdî "Nan û Azadî" ye. Weku tê gotin gelek filmên kurdî lî Iranê tê çekirin lê piştî desthilatda-riya malbata Şahînşahî kurdî tê qedexe kirin lê bes ji ber ku pro-pagandaya şerê navbera Iran û Iraqê bike di wan salan de filmê "Baz" bi derhêneriya Samuel Xaçkiyan û filmê "Duletû" bi derhêneriya Rehîm Rehîmpûr bi kurdî tê çekirin.

Sînemaya kurdan li Iraqê bi dawiya salân 1980î re dest pê dike. Weke mînakêni di sînemaya Tirkî û Iranê de, filmên derhênerên kurd ku li Iraqê çêkirine bi navê "Sîne-maya Iraqê" hatine binavkirin.

Li Iraqê çêkirina filman pirr dereng dest pê dike; nebûna amûrên sînemayê û kesen di warê sînemayê de pispor heta salân 1950î tenê 2 film hatine nîşandan ku ew ji ji aliyê derhênerê biyan ve hatine çêkirin. Yekem filmê serbixwe ku di dîroka sînemaya kurdêن Başûr de gihaye iro filmê "Seîd Efendî (1957)" ye; derhênerê film Kamûran Husnî ye. Di pey re filmê "Pasewan" di sala 1965an bi destê hunermendê kurd Xelîl Şewqî tê çekirin. Gava ku tê salân 1990î, wextê şerê Iraq û Kuveytê Mekî Ebdula filmê xwe "Nêrgiz Bûka Kurdistanê" bi zora heft bela û zehmetiyê çêdike. Film li ser dîldariya keçekê û dergistiyê wê yê ku piştre ji ber çalakiyêن xwe yên siyasî tê girtin. Filmê Ebdula li gelek bajarêن Ewrû-payê ji tê nîşandan. Pêk ve Mehdi Omerê ku li Sovyetan





perwerdehiya sînemayê dibîne di sala 1990î de filmê xwe yê bi navê "Gelê Gorg" çêdike; ev film senaryoya xwe ji çîroka nivîskarekî kurd digire. Herwiha filmê wî "Tonel" ku di sala 1993yan e digire di festîvala filman a Gutenbergê de tê nîşandan. Wê demê gelek derhênerên cîwan ê nola Mehdî Omer li derveyî welêt, xwestine ku li Swêdê "Yekîtiya Sînemagerên Kurd" damezirînin lê negîhiştine vê armanca xwe. Lê piştî dengvedana Komkujiyê Helepçe û Enfalê ji van derhêneran gelek vegeriyane welat û filmên giranbûha çêkirine. Hiner Saleem, Mehdî Umed, Ekrem Silêman, Serbest Resûl û hwd. ji wan kesan in.

Li Sovyetan filmên ewîlî yên li ser kurdan

Weke "yekem roman" û "yekem koma muzîkê" ya kurdî, gava em dimêyzînîn xwediye yekem "filmê bi kurdî" jî kurdêne me yên li Sovyet û Ermenîstanê ne. Jixwe xebatê kurdêni li Sovyetan ên di warê çand, ziman, huner, wêje û folklorê de

berbiçav in. Her çiqas filmên ku li Sovyetan hatine girtin ne bi derhêneriya kurdan bin jî di girtin û nivîsandina wan de xwedî behr û rolêke mezin in.

Yekem filmê li ser kurdan bi navê "Zerê" di sala 1926an bi awayekî bêdeng û bêreng ji aliye derhênerê Ermenî "Hemo Bêknazaryan" ve li Ermenistanê hatiye çêkirin. Ev film lîanîneke romana bi heman navî ya Hacob Xazaryan e. Film berê xwe dide çol û beyarê Elegezê. Mijara film evîna Zerê û dildarê wê ye; li ser jiyan û çanda kurdêni Ermenistanê agahiyêngirîng dide me. Gelekî piştî vê di sala 1970yî de deng li film tê zêde kîrin; kesen ku vî karê hêja dikin jî rewşenbîren kurd ên navdar Casimê Celîl û keça wî Cemîla Celîl bûne¹. Hemo Bêknazaryan di sala 1933an de dîsa di filmekî xwe de kurdan ji xwe re dike mijar û filmê "Kurdên Ezidî" çêdike: film îmtîhana "Mamoste Zeynê" ya bi gundiyênu ku wê

¹ Piştî çêkirina xwe heşte salî 2006an filmê "Zerê" di festîvala filmên Kurd a Londonê de, li gel konserتا Tara Jaff a bi harpê tê nîşandan.

li gund naxwazin re vedibêje. Dîsa li Ermenistanê belgefîlmê bi navê "Kurdên Ermenistana Sovyetê" di sala 1947an de ji aliye Y. Koçaryan ve hatiye çêkirin. Xwediye senaryoya vî filmî jî li gel derhêner, nivîskarê mezin Heciyê Cindî ye. Ev belgefîlm jî li ser jiyan aborî, civakî û siyasi ya kurdan e. Tevî ku film bi ermenîkî tê girtin jî paşê bo kurdî tê wergerandin (wek binnivîs) lê bêreng û bêdeng e. Filmê sisêyan dîsa belgefîlm e: "Kurdên Ermenistana". Di sala 1959an de ji aliye C. Jamharyan ve hatiye çêkirin. Xwediye senaryoya vî filmî jî şivanê kurmançî "Erebê Şemo" ye. Ev belgefîlm jî di asta belgefîlmên beriya xwe de'ye. Film veguherînen 40 salên dawî yên ku kurdêni Ermenistanê di warê aborî, çandî û civakî de derbas kirine, vedibêje. Tê ragihandin ku nêrin û gotinê zimanzanê mezin Qanatê Kurdo jî di vî belgefîlmî de cî digirin. Filmekî din jî heye ku em dikarin behs bikin; lê ev film weku filmên li jor baş nayê zanîn: "Dostani." Ev belgefîlm jî li ser dostaniya kurd û ermeniya ye; ji aliye L. Grigoryan ve hatiye çêkirin. Li gor ku tê gotin dema Ermenistana Sovyetan gelek filmên din derheqê kurdan de hatine çêkirin lê sed mixabin ku negîhiştine iroyîn. ♪

ÇAVKANÎ

KÜRT SİNEMASI: Yurtsuzluk, Ölüm Ve Sınır, Derleyen: Müjde Arslan, Agora Kitaplığı.

Sinemaya Kurdan, Kovara W. Hejmar: 45.

Türk Sinemasında Kurtler, Müslüm Yücel, Agora Kitaplığı.

Göçeve İmajlar, Nihat Nuyan, Avesta Yayınları.

Ligel Celîlê Celîl Pirs û Bersiv: **14 Nivîskar û Şair, 14 Pirs**


**İlhamî Sîdar, Samî Tan, Recep Dildar, Şeyhmuş Diken,
Omer Dilsoz, Mem Bawer, Îrfan Amîda, Zulkuf Ergun,
Îsmaîl Dîndar, Fewzî Bîlge, Zeyneb Yaş, Gulîzer,
Sîdar Ozmen, Ulku Bîngol**

Em weke Kovara Dilop spasiyên xwe pêşkêşî Celîlê Celîl ê rêzdar dikan bo vê hevpeyvîna bêhempa. Celîlê Celîl emrê xwe bi xebatê folklorê bihurand. Ji ber hindê qedr û qîmeta wî li cem me gelekî ye. Em pê bawer in ku dê kurdîaxêv û kurdînûs piştî çendik û çend salan jî ji xebatê wî sûdê werbigirin.

Me weke kovar ji 14 şair û nivîskarê kurd pirsî bê ka dixwazin ji Celîlê Celîl çi bipirsin. Wan jî her yekê pirsekê amade kirin. Axirê hevpeyvîneke nuwaze derket pêş xwîneran.

Divê em bidin zanîn ku me weke editoryaya kovarê midaxileyê awa û şêwaza nivîskî ya rêzdar Celîlê Celîl nekiriye, ya rastî me nexwestiye em midaxile bikin. Wî bi terz û şêweyê kurdiya Sovyetistanê pirsan bersivand û me her bi heman awayî pêşkêşî xwîneran kir.

Deşîfrasyon: Ali Gedik
Fotograf: Hüseyin Tunç



● İlhamî Sîdar.

Cenabê we umrekî li ber folklorâ kurdan ber ba kir. Dî jiyanâ we de çi bû sedem ku we berê xwe da xebatêni bi vî rengî?

Sedama ku min berê xwe daye folklorê hema carkê va despê nekiryê û tiştekî va tenê girêdayî nebûye. Ew prozêsek bûye, ku cem min bi tiştekî biçük va despê bûye, ku bawer bike min bi xwe jî texmîn nekiryê ew ê bive çi. Pirsa te pêdike ser min, wekî ez bi his û bîranînên xwe va vegerim ser salên zarotya xwe. Belkî ha ez karibim despêka şop û bandûra folklorê ser xwe bibînim.

Xuya ye ku bona her kesî jîyana heft-heyştsalyê despêka xwendinê li dibistanê ew gava pêşin e ku zarok ji malbetê der hêdî-hêdî dinya nas dike, cîyê xwe li vê dinya gewrik da dişopîne. Bona wê her tişt li dorê balkêş e, nû ye. Dîtin û naskirina dorbera xwe, dinya fire û mezin, ew gişk hê ne ewqas girîng in, çiqas despêkirina naskirina herfa, xwendina pirtûka.

Xwendina dibistanê ew despêka rîya jîyana te ye. Ew rê ne hergav rast e, şîşsat e û hêsa ye. Xwendin ji pirtûkên dibistanê û yên ku li nav malê hene, despê dibe.

Ji roja dayîkbûnê kîbûna te li ser enîya te nivîsîye. Ka tu kurd î, ermenî î, rûs î, erreb î, faris î yan turk î. Ji kurdbûna xwe nikarî birevî, li ser xwe nas nekî. Hergê dê û bavê te, mezinê malê vê yekê nas dikin û pê serbilind in, tû jî vê yekê dikî. Mal, malbat şertê girîng in ser rîya jîyana te, bona ku tu karibî duarojê di civakê da cîyê xwe bibînî (bigri), xwe bidî nasandin.

Ji serê sêrî da, hê ji çûktaya xwe min dîtye, wekî mala me bi pirtûka va dagirtî bûye. Çawa? Bavê min hên di xortanya xwe da, dema salên xwendinê li bajarê Bekûyê li dibistana leşkeryê da (1927-1930) xweyê 10-15 pirtûkan bûye, yên ku ser kurda hatibûne nivîsandin. Salên 1932-1938an hijmara pitûkan li "pirtûkxana" bavê min ji çendsedî derbaz bûye. Li van salan ew li Bajarê Yêrêvanê wek berpirsyarê çapamanîya pirtûkên kurdî kar kiryê. Ji hemû pirtûkên ku wî çap kiribû ji yek mînakî zêdetir li dolabêna mala me da dihatin parastin. Pirtûkxana wî da ji pirtûkên kurdî zêdetir pirtûkên bi zimanê ermenî û rûşî ji hebûn. Bi gîlikî ji salên dibistanê, navbera deh salan, heta min xwendina xwe dawî anî,

piranîya kilasîkên ermenîya, rûsa û yên dinyaê, idî xandibû.

Bavê min dolabeke taybetî da pirtûkên ser kurdâ nivîsi diparast. Derî kîlît kiribû û kîlît ji sparibû dîya min wekî veşere û hêsanî dest me nekeve.

Sala pêşine xwendina min di unîvîrsîtêtê da ji min ra despêka dewreke nû bû. Ew sala 1954a bû, sala ku radyo xebandanê kurdî ji Yêrêvanê despêkirin. Bavê min berpirsyarê van radyo xebdana bû. Vebûna radyo xebdanan atmosfêra jîyana mala me guhast. Her heftê stranbêj, rewşenbîr ji gunda dihatin mala me mîvanî, wekî axaftinê xwe, berhemên stranbêjya xwe radyo êra bihêlin. Mûzîkar dihatin. Dengê def û zurnê wana ji mala me kêm nedibû. Kêfa bavê min bi wan stranvan û mûzîka ra gelek xweş dibû. Ordîxanê birê min xwendina unîvîrsîtê xillas kir û dest bi têza xwe ya doktoryê kir ser mijara dîroka Kela Dimdimê û cîyê wê di zargotina kurda da. Ji ber vê diçû gunda şaxên vê dasstanê dînivîsî. Jîyana zargotin bere-bere şaxê xwe di mala me da vedida. Gundê ku mala me pêra girêdayî bû, hergav havînan em bona hê-sabûne sê meha diçûn Sîçanlû bû ke ser sîngê Elegezê hêwîribû. Jîyan û çanda gelêri li vî gun-dî wek berê xurt mabû, zargotin tijî, zozan nêzîkî gund bû, çûyîn hatina zozanvana ser vî gundî ra bû. Baldarya min ser nivîsandina zargotina kur-dî ji wî gundî despê kir. Dora Sîçanlûyê gundê ermenya bûn, xelqê van gunda ji Sasûnê bûn, hemû jî bi kurdî zanibûn, tim bi kurdî distiran û bi hev ra jî xeberdida.

Sîçanlû bû ku kurdhizya min xurt kir, evîna ser zargotinê di dilê min da hêlûna xwe çêkir. Ji wan roja heyâ iro, ku bi temen idî ez gihîştime şêmîka kalbûnê, ew evîn cem min kêm nebûye, ew ji mi ra bûye hêz, hisa xortanîyê cem min geş kiryê. Heta nefes ber min da hebe, ezê ber xizmeta wê zengînya zar û zimanî bim. Zargotina kurda bona min hewa ye, ruh e, aqil û his e, huner û cuwanî ye, kurdbûn e.

● Samî Tan:

Li Tirkîyeyê û bakûrê Kurdistanê kurd çawa dikarin ji qada akademîk sûde wergirin? Di xebatêni dîroka kurdan de cihê dîroka devkî (oral history), girîngiya berhemên zargotinî ci ye?

Bona ku li Turkyâê û ji sînorên wê der karibin suda akademîk ji zargotina kurda bigrin, divê berî pêş wê ji rewşa gotina bi zar bînin ser rewşa nîvîski, pêşyê ci çîrok be û ci stran be, her axaftineke gelêrî ser şirîten denggirtinê tomor bikin, arshîv bikin, binivîsin, paşê biweşînin û ser lêkolînêna akadêmîk bikin. Divê bîr nekin, her tişt ji wê zengînîyê ku bi zar tê gotin, zû-dereng tevî zarbêja, zanayêñ vê mîratê wê unda be, tevî wana wê here gorê. Gava tiştêñ tomarkirî ber dest bin, hêja dikarin sûdê jê bigrin. Sûd nek tenê bi lêkolînêna akadêmîk jê bigrin, lê usa ji li bergeha pêşxistina hunerê kar bînin, çanda neteweyî pêş bixin. Bona pêkanîna vê armançê divê: **1.** kesên jîr û çeleng hebin, bi evîna dil destê xwe bavêjin karê tomarkirinê! Zanîn hebe ser girîngaya zargotinê; jîr, jêhatin û pisporî hebe li cem her rewşenbîrekî kurd ku xwe bidine ber vî karî. **2.** Divê, sazîyêñ çandî û perwerdeyî, ji dibistana despêkirî heta unîvîrsîte û sazîyêñ zanyarîyê (akadêmîk) tomarkirina zargotinê bi plana karkirinê despê bikin, herêm bi herêm, gund bi gund, zozan bi zozan herin bi têknika îroyîn va karê xwe bikin. Kîler, zexîreyêñ taybetî bi cewahirê zargotina va tije bikin û hingê bifîkirin çawa sûda akadêmîk jê bigrin. Hêñ zêde bêjim. Zargotin cuwanî, şewq û şemala xwe, xeml û nexşê xwe wê ber we raxe, gava hûn tevî tomarkirinê bersivê gelek pirsan jê eşkere bikin. Wek mînak ser tradîsyonê jîyandarya zargotinê; rê mecalên taybetî yên ji hev wergirtina mînakên xezîna gelêrî di navbera nivşan da; bûyarêñ girêdayî bi pêşdahatina her berhemekê va û gele pirsêñ mayîn.

Divê timê berçavan be ku berhemên zargotinê çavkanî ne her usa ji bona hunerê, edebyatê, dîrokzanîyê, zimanzanîyê, mûzikzanîyê, gelnasîyê, filosofyaê, civaknasîyê û hwd.

Pêkanîna vê armancê wê hêsa be gava gel, civak, sazîyêñ wê, rêvebirêñ admînîstratîv yên herêman, qeza, nehîya û gundan, malmezin û merîyêñ navdar pişgîrya vî karî bikin.

● Receb Dildar:

Hema bibêje we di hemû jiyana xwe de li ser dîrok û zargotina kurdî xebat kir. Wek ku cena-bê we jî dizane, di şoreşa neolitîk de kurd gelek li pêş bûn, heta şarezayê cîhanê bûn. Ci hat serê wan ku niha li paş hemû cîhanê mane?

Çîma nikarin bibin yek û dewleta xwe ava bîkin? Sebeb ci ne?


Rast e; kurd wek êtnos di jîyana siyasî da cîyê xwe di rêza dewletêñ cînara da bi serbestya xwe cîyê xwe negirte. Lî li dirêjaya dîrokê gelek kurd bi hişmendî, serxwebûn, tuwane û jêhatya xwe li nava cînara da xuya û navdar bûne. Dêmek sedema şûnvamayîna kurda di bergehêñ obêktîv da divê bigerin.

Welatê kurd, colana wana, kakilê kurdbûnê li ser rêzeçîyayêñ Torê û Zagrosê bûye. Herdu çiya sînorêñ navbera şaristanîyêñ Roavayê û Rohilatê, Bakûrê û Başûrê bûye. Kurd şadeyêñ avabûn û jihevketina dewlet, şaristanêñ mezîn bûne. Împératorî hatine û derbaz bûne, gel hattine û derbaz bûne, lê kurd bi çîyayêñ xwe zêndî mane.

Çiya ji alîkî va, gelê kurd ji derpêñ hêrişkaran yên kuştinê parâstye, jê ra bûne bastyon (hasêgeh), alîyê dine va civaka kurdî birr-birrî kirye û paşila xwe da hasê xwey kirye.

Gotinek heye; divêjîn eşîretî rîya hevgirtina gelê kurd girtye, ji ber vê jî kurd nebûne xweyê dewletekê. Eşîretî katêgoryeke sosyal abûriyê ye û hevgirtineke çekdarîyê xweparastinê ye ku sîstêma wî ya civakî yêrarkalîyê pêra heye. Mînî revabirya serbixweyê ye girêdayî bi erdekî ser rûniştinê û havingeha (zanîya) tradîsyonal. Eşîretî bona hine êtnîk grûpa ra jîyana nomadîv va girêda ye. Eşîretî di nava kurda da bingehê wî ne koçberî ye. Bingeha wî taybetya abûrya wê ye, ku zozanê va girêdayî ye, hilgêr û dagêrê va girêda ye. Jîyana ha modêleke hişk nîne, rengrengîn e her deverekê bona hine eşîreta da taybetîyêñ cudatîyê bi wana ra heye. (Evana hemû bergehêñ lêkolînêna taybetî ne.) Ser vê pirsê gava min lekolîneke xwe li salêñ derbaz bûyî amade dikir nivsara dîplomat, zanyarekî înglis Roûlinson bala min kişand, ku dora 170 sal berê gava ser herêma Hekkarîyê dînivise, divêjîe kurdêñ Hekkarîyê parave dibin ser 23 eşîreta, navê wana yeko-yek dînivise û ser da jî zêde dike, wekî evana her usa jî navêñ wan herêman e ku ewana li ser dijîn.

Eşîretî katêgoryeke ko jîyana koçberîyê va girêdayî ye. Hergê navê erd navê eşîretê ye, wek Roûlinson dînivise dêmek ewana koçber nînin, jîyana wana, jîyana zozana va girêdayî ye,



gundê wana hene. Heger em bi hûrbînî navê eşîretên kurda yên çûk û mezin, strûktûra fêdê-rasyona (hevbendya) eşîreta binêrin, dibînin ku navê piranya bi navê erd, cî warê wana va girê-dayî ye, yan jî navê cil û bergê wana bûne navê eşîretê(!). Mînak: eşîrên berava, şerqya, dasinya, çuxreşa, çuxsora, kumneqsa û yên mayîn. Dînyayê ji Yêvropayê girtî, hêñ berfire hene xelq ku bi navê herêmên xwe va hatine naskirin û kes navêje eşîr in.

Bêdewletmayîna kurda sedem ew e; wekî dewletên ku Kurdistan nava xwe parave kirine nehîştine ku civaka kurdî li ser vî erdî çêbe. Bi xurtaya hêza leşkerî zor kirine ser kurdan, bî-nelîyên erdhêsin kirine ku bimînin bê abûrya netewayî, bê zar û zimanê kurdî, bêxwendin, bê çand û hunera gelêrî. Asarên dîrokî wêran û binav kirine, gund vala mane. Ha bûye berê û naха rastiya jîyana kurda.

• Şeyhmus Diken:

Ez dixwazim hûn miqayeseyekê yan danber-heviyekê bikin. Hûn weke kurdek li Yêrevanê, li Ermenistanê jiyan. Paşê hûn li Ewropayê bicî bûn weke dîrokzaneke kurd. We gelek caran serdana erdnîgariya kurdan kir û hûn hêna jî

dikin ku ew erdnîgarî sedemâ hebûna we bi xwe ye. Hûn xwe aîdî kê derê dibînin? An ev rewşa we bêwar û bêwelatbûn e?

Û berdewama pirsê jî wisan e: li van ser sê erdnîgariyan insan we aîdî kê derê dibînin? Û ev meseleya aîdbûnê ruhiyetekê çawan peyda dike li we?

Belê, ez li Yerêvanê (Ermenistanê) ji dayka xwe bûme û min xwendina xwe li vir pêşiyê li dibistanê û paşê jî li unîvîrsîte girtye; salêñ dirêj wek lêkolîner min perwerda xwe li Sanktpêtêrbûrgê, Moskvayê (Rûsyayê) girtye û naka jî eva idî 27 salin ez li Yêvropayê me (Austrayê). Ez wek penaber nehatime Yêvropayê û min bajarvanya xwe neguhastye. Vira jî min karê xwe, pispor ya xwe li ser kurdzanîyê meşandiye li unîvîrsîte, akadêmîyayê û Înstîtûta Pêdagogya Viyênatê.

Ez bi hisa xwe wek kurd mezin bûme, min xwendina xwe bi zimanê ermenî girtye. Rûsî, ermenî, almanî min lêkolîn û mamûstatyê kirye. Pirtûkêñ min ku nivîsîne bi kurdî, rûsî, ermenî û almanî bûne.

Îjar ez bêm ser pirsa te. Hisa xwe (îdîntîtêta xwe) û welatê xwe ez ser kîjan dewletî nas dikim, ne usa?

Bi Xwedê, pirseke usa ber min tucara ranebûye. Heger his û navaroka jîyana min ser kudayetîyê bûye, min jîyana xwe ya 83 salan ser kurdbûnê meşandye; kar, zanistî û tuwanaya xwe ser gelê kurd xerc kirye, ber min pirsa ka welatê min kîjan e tunebûye. Her kes xwe ser kîjan gelî dihesibîne, welatê wî jî wê derê ye. Welatê jîyanê û welatê ruhê te gelê te dikarin yek nîbin. Kî xwe ser çi gelî dihesibîne, welatê wî jî divê ser navê wî welatî be. Divê wa be, lê her kes azad e bona xwe welat hilbijêre. Bingeha welat ne tiştê kirin, firotana bazarê ye.

Dibe, wekî kes hebin idêntîtêa xwe ser welatê ku tê da ast û barişt, têr û tijî dijîn, bibjêrin. Ew mafê wan e. Lê welatê te ku bin zulmê be, gelê te bê maf û perişan be, idêntîtêt, bi dîtina min, divê neê guhastin, bimîne li ser wî erdî û li ser wî gelî ku ya dayka te ye, ya kal û bavê te ye. Ji vê şûn da ji min bipirsin, ka welatê te? Ez ê bêjim welatê min, gelê min bi min ra ne, di dilê min da ne. Ez ku jî bûme, ci rewşî da bûme, navê welat û navê gelê min nehatye guhastin. Kurd û Kurdistan ser zarê min maye. Belkî di pirsa te da fikrek heye, ku tu dixwazî bersiva xwe ser wê bistînî, gelo yek wekî di welatê xwe da, nava gelê xweda nejiye, zimanê mayîn xwendîye, gelo welatê dê jê ra çiqas şîrîn e, mereqlî ye?

Ez bona xwe bêjim. Di vê rewşê da, berî ku ez carekê herim welatê kal-bavê xwe bivînim, kîjî parce jî ew bive, ew der bi dengê xwe, zimanê xwe, dilê min da idî cî girtye, aqilê min da rûniştye. Welat nabjêrin. Idêntîtêt tê gorîn gava hisa hundurîn cem yekî ser gel û welat qels bûye.

● Omer Dilsoz:


Rêzdar, pirsa min hinekî taybet e; heke jiyanê bi hevokékê bibêjî dê bibêjî ci?

Jîyan dîyariya Xwedê û sirûştê ye ku bi xêra dê û bava gîhîstyê me. Divê em spasdarî herda bin heta dijîn.

● Mem Bawer:

Di çand, folklor û çîrokên kurdî de, helbest bi ci awayî hatiye bikaranîn û girîngiya wê ci ye?

Di zargonina kurdî da çîrok (ji gotina çêrkirin, gotin tê) û hilbest, herdu jî serbixwe cûrê berhemdarîya zargoninê ne. Janrên ku hilbestî têne gotin ew stran in (yên dîrokî, şera, dewatê, şînê û hw.), çîrokî (pexşanî, ew çîrok, hikyat, çîvanok qelîbotk in, nükte ne û hw.) Berhemên janra dastana paê pirê çîrokî û him jî strankî-hilbestkî



têne gotin. Berhemên vî rengî berê aşiqêñ gelêrî kar anîne. Berhemên hilbestkî alîyê kês û qafiyê di zimanê kurdî da gelek belabûyî ne. Zimanê me di bingeha xwe da gelek poêtî ke, her gotineke hêja gel dike bi qafî û distirê yan jî divêje û ew xweşî guhdarvana tê. Hergê em bala xwe bidin ser gotinê pêşîyan, em dibînin, wekî her cara em rastî du, sê rêzên hilbestkî hûnandî tê. Berhemên ha zû dîbin bingeha stranan û di her şayîkê, govendekê da distirên. Berhemên hilbestkî hêsa dîbin bingeha strana. Girîngiya wê jî her ûsa mezîn e çawa janrêñ zargotina kurda yêñ mayîn.

● İrfan Amîda:

Nizanim hûn ê jî bipejîrînin gelo; qedera neteweyan li gorî çîroka wan diyar dibe ango dîrok û çanda neteweyekê çîqasî xurt bin hêviya rojén pêş jî ewqasî xurt e. Di vê peywendê de hûn wekî dîrokzan û folklorîsteke kurd pêşeroja kurdan çawa dibînin?

Dîrok û çanda kurda wek netewe di navbera sedan salan da gelekî xurt bûye û naka jî xurt e. Pêyîstî tune bijmîrin ka di dîrokêda mîrxasî û xuyatya xwe kurd çend caran mak kirine (îzbat kirine). Ew eşkere ye. Çiqa çanda gel xurt be ewqas xurt dibe têgîhîştina girîngiya azadîyê.

Pêşeroja gelê me bona gîhîştina armanca xwe ya serxwebûnê ez bi bawerîya mezîn va dipêm. Her tenê divê em baş bizanbin; wekî ser vê riya şanaz da zanîna zimanê kurdî çîqas bîhêz be, em ê ewqas zû û serwaxt dergê azadîyê ber xwe vekin.

● Zulkuf Ergun:

Bi rastî jî kurdan bi nirxên Sovyetê bawerî anîbû yan di bingeha vê de tirsa rejîma totalîter a Stalîn hebû? Bi kurtî hûn li ser raya piraniyê ne yan li ser raya Ehmedê Hepo ne?

Li Sovête berê rejîm jî hebû, mefê gelan û êtnîk grûpêñ çûk û mezîn jî hebû. Tu kes û tu sazî nikaribû bi fermî mafê yekî binpê bikira. Kurdê Sovêtê li Kavkazyâ, li komarêñ Azîrbêcanê, Gurcistanê û Ermenistanê diman. Mafê kurdan di jîyana piraktîk da li van hersê komaran da ne weke hev bû. Kurdêñ Gurcistanê xelqê bajarî bûn. Piranî li Tilbîsê diman; kurdêñ Azîrbêcanê li ser herêma navbera Karabaxa çîyayî

û Ermenistanê bûn: Laçînê, Kubatlıyê, Zengîlerê û Kelbecarê. Kurd di wan herêman da idî 700-800 sal berê diman. Despêka sedsalya 20î hine lêkolînar dînîvîsîn ku kurdê van herêman zimanê xwe hê parastibûn. Rêvabirêñ Azîrbêcana Sovêtê li salêñ despêkê mafê kurdan di komara xwe da bi dilkulekî naskiribûn, lê çend salan şûnda mafê wana gelek kêm kirin. Kurden Gurcistanê piranî li bajarê Tibîlîsîyê diman. Rêvabirêñ komar zêde xwe nedêşandin, wekî çand, huner û xwendewarya kurdîn pêşda here. Li Ermenistanê tradîsyona dostanîyê navbera eremenîyan û kurdan ji berê da hebû û li ser vê bingehê jî mafê kurdâ li komara nû da hate naskirin û gavêñ piraktîkî jî hatin avîtin.

Lê pîrsa te li ser "raya piraniyê" û "raya Ehmedê Hepo"-ye, ez rast bêjim pê nas nînim, wekî ez karibim bersiva te kamil bidim. Bibûre.

● Ismaîl Dîndar:

Celîl Celîl, ji bo kelepora gelê xwe xwest çi bike lê ji dest nehat. Her weha ji nifşê nû çi dixwaze?

Tiştê ku xîyala min hebûye ku ez bikim û ez negîhîştîme, ji destê min nehatye, ev e: ji salêñ xortyanîyê min xîyal kirye ez bibim dewrêşek û tûrka dewrêşîyê bavêjim pîyê xwe, gav bi gav, gund bi gund nava gel bigerim û zargotina kurdî tomer bikim. Gorî hêz û karîna xwe ez li gundêñ kurdêñ Ermenistanê û li nava kurdêñ bajarê Tibîlîsîyê geryame û min têra xwe kar kirye û tûrka xwe tiji kirye. Lê ji min ra xewna şevan bûyê herim Kurdistanâ mezîn û li wê "dewrêşîyê" bikim. Li sala 1982a gava temena min gîhîştibû 48ê, ez cara pêşin çûmê Sûryayê, nava kurdâ û ji wê şûn da gele cara geryame li her çar parçê Kurdistanê û kar kirye. Rastîyê bêjim, temenek ne deh temen jî bi mi ra heba, kar xilas nabe û ez jî têr nabim.

Daxwaza min ji nifşê nû ew e; wekî ewana hemû dera, li gunda, li çîya, ser rê, ji çûk û mezîna bipirsin, gotinek, hilbesteke gelêrî, çîrokekê jî hebe, binivîsin, dengê wana bigrin, wekî unda nebin.

Meriv ji bona mirinê tê dinyaê. Ew di nava salan da dibe xayê zengînya zar û zimanê gel, stranê kal bava hîn dibe û te hew dît rokê jî ewî pişta

xwe da me û çû... Her tişt bi xwe ra bire gorê. Bikin, wekî ew zengînya gel unda nebe.

Ser rîya pêkanîna vê armancê, ez ji we ra serketinê dixwezim.

● Fewzî Bîlge:

Têkiliya folklor û nivîsê(edebiyatê) bi hevdu re çiqas girîng e, di vê çerçewê de pêşniyarên we ji bo nivîskarêñ kurd hene gelo?

Têkiliya folklorê û edebyetê bi hev ra heye û gelek jî girîng e. Folklor çevkanî ye ji bona pêş-daxistina edebyetê. Berî pêş ez bêjîm, wekî zimanê kurdî bi peyva va, sifeta va, berhevdana va gelekî têr û tijî ye. Filosofya gel, ruhê wî ku li folklorê cî girtye, ew hêz e bona ku berhemên nivîsarvana, bi nêzîkî ruh, xem û xîyalên gel va girêdayî bin. Folklor weku ava aşê ye bona karkirina beraşa edebyetê. Dema me girîngiya zargotinê bona gelê kurda berfire nirxand, em ê bibînin wekî bandûra wî ser pêşketina edebyetê, mûzikayê, ser çand û hunerê mezin bûye. Ziman û zargotina gel bingeha asasî bûne, wekî edebyet bi reng û rûyê gel va xemilandî be, wekî berhem bibin milkê gel. Em bînin bîra xwe edebyet, çand û hunera gelên kevn: yûnana, Împératorya Romayê, Bîzansê. Binhîrin; çiqas berhemên dîrokî yêñ naskirî ku ser bingeha mîtologîya wan gela ava bûne, ji dewra wan hatine gihiştine destê me. Ewana bûne bingeha bona şanoya (têatr), dastana, romana, opêra, sîmfonya, balêta, nivîsên pexşanî, poêm, hilbest. Çiqas nîgarkêşen dinyaê yêñ eyan berhemên xwe ser navarokên mîtologîya kevn, ser kevirên marmorê mor kirine, ser kitanan dîmenên ji wan mîtologîye bi rûnên rengerengî nitirandine.

Ewana hemû di mûzeyêñ dewletêñ here pêşketî da cîyê xwe girtine.


Miletik ku zargotina wî bê şop unda bûye, yan jî qels bûye, negihîjtye rojên me, edebyeta wî çiqas jî pêşda çûbe, ew dimîne wek zarokek, ku bê şîrê dîya xwe mezin bûye.

● Zeyneb Yaş:

Li nav kurdêñ Kafkasya dengbêjî kî ne, zarbêjî kî ne? Û gotina dengbêjî li nav kurdêñ Kafkas-yayê çawa cî girtiye?

Di gotina zarbêja da cî digre hertiştê ku bi axaftinê, deng tê gotinê û hînbûn xwendinê va girêdayî nîne, berhem dev bi dev, nivş bi nivş jîyan dike. Meydana jê hînbûnê va hunera devkî dîwan, oda, civak bûne. Rewşa jîyana berhema derge vedike wekî şaxên berhema peyda bin. Her hozanvanek, teybetya hunermendya xwe tev dike û şax çêdibin. Eva yeka zêda di bergeha stranvanyê da cî digire. Ser peydabûna şaxên berhema: destana, strana bandûr dihêlin herêmên êtnîk, tradîsyyonêñ zargotinzanîyê yê herêmê, eşîrî, êtnografika pirrengî.

Li nava kurdêñ Kavkasyayê dengbêjîya tradîsyonal, înstîtûta dengbêjîyê dema Sovêtê tunebûye. Stranbêjî hebûye, bi hezara stranbêj hebûn, milet bi xwe stranbêj bû. Çima divêjim dengbêjî tunebû. Bona bersiva vê pirsê, divê ez ji xwe ra rast kim, ka dengbêjî li Kurdistanê ez çawa dibînim. Her kes ku distirê ew nabe den-gbêj, ew stranvan e. Dengbêjîyê ra: a) Divê şureta zû hefizkirina berhema carekê bîhîstî hebe. Wek stranvanê çeleng divêjin. "Bes e destanek, stranek tek carekê bibihêm, ez dikarim ji despêkê heta dawîyê bêjîm." b) Divê evîndarê zargotina kurda mîrata kal û bava ye zargotî baş nas bike. c) Divê şureta împrovîzasyaê, şureta berhemdarîyê pêra hebe. Bi xwe ser bûyara, ser merya strana bisêwirine. d) Dengbêj divê civakê da naskirî be, hûnera wî alîyê gel va hatibe pejirandin. Li dîwana xana da na, axa û bege da, oda da cîyê xwe yê girîng gjirtibe, statûya sosyal pêra çêbe, alîkarya sosyal ji xayê dîwanê bistîne, bive endamê dîwana, civaka serokê yê herrojî. Xanedan cîkî çû dengbêj jî pêra here, şera da rex axê xwe be. Büyarêñ girîng ji jîyana civakê, jîyana xanedan, mirin yan kuştina wî bike mijara berhema xwe ya nû.





Zeyneb Yaş û Celîl Celîl

Pey vê tenê, navê dengbêj tevî navê xanedan tê gotin. Navê wî nava êl û eşîra bi navê axê wî tê naskirin. Divên filanches dengbêjê filan pasayî, begî, axayî ye. Navbera dengbêja da lec jî hebûye, ka dengbêjê kîjan axayî ji yên mayîn xurtir e. Li Sovêtê bingeha vê sîstêma sosyal gelêrî tunebû. Dewlet li dengbêjêن profêsyonal xayî derdiket. Ewana di despêkê da bi rengê aşiqtyê dihatin naskirin. Aşiqtî li Rohilata nêzîk û navîn da naskîr bûye, lê nava kurda da ew zêde bele nebûye. Di hine wutarêن Prof. Dr. Ordîxanê Celîl da mijara dengbêjîyê û mînakên dibistanya den-gebêjîyê hatye behskirin. Lêkolîna Înstitûta deng-gebêjîyê mijareke taybetî ye bona lêkolîna zanistî.

● Gulîzer:

Kurdên Sovyeta kevn belav bûn, li Bakurê welat nifşen nû êdî bi kurdî naaxivin, li Başûrê welat Soranî serdest bûye, ji bo siberojê hêviya we ji bo Kurmancî û edebiyatê çi ye?


Li Îraqê herêma kurmancîaxêv (Behdînanî) bona pêşvaçûyînê, ku bive zimanê xwendinê û nivîsandina xelqê herêmê, derge ber wana hatye girtin. Behdînanî bi zengînya peyva, zargotinê, dîrok û asarêن xwe va xezîneke bêhesab dewle-mend e, lê daxava hêne ne bûye hêjaya baldarya rêvebirya herêmê. Şans û êmkanyata kurman-ciyê, ku bive zimanekî serkeş bona giştya zi-

manê kurdî, mezin e. Li Turkyâe kurd idî ser vê rîya pîroz in û destanînê wana berçevan e. Kur-mancya Behdînanê û Kavkasyaê, tevî zimanê kurdêن Suryayê gele carabihêztir e û duaroja wî qet ciyê xemkêşiyê nîne. Bi dîtina min jîyandarya soranî rex kurmanciyê nêzîk aqilane û hebûna wan herda rex hev bi giştî wê bivê zengînike bê mînak bona çand û zimanê gelê kurd.

● Sîdar Ozmen:

Weke ku tê zanîn xebatê berhevkarî û tomarkirinê yên derbarê folklorâ kurdî hêj ji sedsala 19. û vir ve têن kirin lê mixabin xebatê analîtîk nû dest pê dîkin. Gelo sedema vê çi ye, bo çi kurd di vî warî de dereng man?

Berhevarya folklorâ kurdî ji roja ku kurdologî despê kirye, pêşyê ferheng, rêziman hatine amadekirin, zimanê kurdî bi zanstî hatye lêkolînkin, pê ra jî berhevarya têkstan despê bûye. Bê to-markirina têkstêن gelêrî ferhenga pêyyên kurdî nedibû. Ji sedsalya 19. despêkirî dehan pirtûkên ser zimanzanîyê jî hene ku pê ra jî têkstêن zargo-tinê çap bûne, mînak in: pirtûkên A.Jaba, P.Lêrx, A. Sotsin, Yê. Pirûm û yên mayîn. Paşê li sedsalya 20î li Sovêtê berhemên K.Kurdoyêv (Qanatê Kurdo), Î. Tsükêrmann, Î.Smirnova, Z. Yüsûpova û yên mayîn çap bûne. Hêjayî destnîşankirinê ne her usa jî berhemên zanyarê Angilyayê. Berhev-



karya zargotinê bi şertên zanistî berfire despê bûye li Yeketîya Sovêtê: Moskvayê, Pêtêrsbûrûgê, Ermenistanê (Yêrêvanê). Li berevokên ser zargotinê çap bûyî timê pêşgotinêni zanyarîyê hebûne. Li Sovêtê lêkolînêni kurdologîyê ji salêni pey şerê cihanê yê duda despê bû. Çima karê lêkolînê li Turkyât tunebûye? Eyane: axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî qedexe bûye, idî ku ma lêkolîn. Li Yêvropayê jî baldarî ser lêkolînêni zargotinê tunebûye, ji ber ku berevkarî tunebûye. Bona lêkolînê nasîna civakê, şertên zanistya jîyandarîya zargotinê divêt hebyana. Mercen weha li Turkyayê û dewletên cînar da tunebûne. Bi xwe kurdnasîya berfire bi diroka xwe va zanistîki temen dirêj nîne. Îro lêkolînêni zanistî nek tenê ser zargotinê, lê usa jî ser civaknasîyê, bîr û bawarya netewetîyê ser dîrokê, êtnologîyâe û bergehêni zanistyêni mayîn gelek berfire bûne.

Bona lêkolînê civaka kurda îro amade ye. Divê îro karê tomarkirinê û lêkolînaryê bi hev ra bê meşandin.

● Ulku Bîngol:

*Ji 3ê gelawêja 2014an û heta îlona 2014an
(êrişa li ser Şingal û Kobanê û sekna li hem-*

ber van êrişan) dinya bêtir bi kurdan hesiya. Gelo li gor zanîna cenabê we, dibe ku mirov vê dîrokê wek destpêka Qonaxeke Nû(Îlona Nû) ji bo wêje, hunera kurdî hilgire? Cenabê we baştir dizanin ku hinek bûyer bandorêne mezin li ser civakê, huner û wêjeya wê civakê dihêlin. Minak: 1071(Melazgir), 1639(Peymana Qesra Şîrîn), 1847- 1925 (Ji hilweşandina Mîrektiya Cizîrê heta dawiya şerê cîhanê yê yekemîn û herba Şêx), 1932-1951(Ji Hawarê heta dawiya şerê cîhanê yê duyemîn), 1962-1978(pêla nifşê 68an), 1978-2014(Diaspora-Tîrêj-Rewşen)...

Sedsalya 20. dinya cara pêşin pey şerê cihanê yê duda bi kurda, bi serhildana kurdên Îraqê, bi serokatyâ Mela Mustefa Barzanî pê hesya. Îjar jî ser gelkuyja Sîncarê ser kurdên êzdzî dinya pê hesya. Her serhildanek, her gelkuyjeyeke gelê kurga timê dîrokê da bûye qonaxeke nû û reş bona gelê me, mînaka xemsarya dinyayê ye her usa jî himberî kurdên Dêrsimê, kurdên gelîyê Zîlan, kurdên Barzanî, Kurdên Kubanîyê, kurdên êzdzî û ser yên mayîn hebûye. Hilbet her bûyerek, şipûkek bûye bona gel û bandûra xwe hîştye ser ji-hevketina civaka kurd, ser koçberîya, xerîbbûna bi hezaran, mîlyonan xelqê am û tam, ser çand û hunerê, ser wêrankarya abûrîyê.

Yaşayan bir tarih, bir kültür ağacı:

Celilê Celil

İLHAMİ SIDAR

Aynı coğrafyada yaşayan, aynı kaderi paylaşan halklar süreç içinde ortak bir kültür yaratırlar; inançlarını, gelenek göreneklerini, törelerini, edebiyatlarını, müziklerini, giym kuşamlarını, oyunlarını ve ortak yaşamalarının daha pek çok paydasını içeren bu kültür onların genetik kodlarını oluşturur. Bu kodlar ortak bir dil etrafında birleşen milletlerin, deyim yerindeyse, anatomi yapısını da şekillendirir aynı zamanda. İşte folklor bir halkı bu ortak yaşam paydalarından hareketle ele alarak inceler. Bu bakımdan folklor araştırmaları halkın kültürleşme sürecinin aydınlatılmasında büyük önem taşır.

Vikingler kim? Angllar, Saksonlar, Franklar, Gotlar, Vizigotlar, Germenler, Ariler, Hurriler, Mitaniler, Medler..? Kim barbar, kim uygar, kim

göçebe kim yerlesik? İsveçliler, Norveçliler, İngilizler, Fransızlar, Almanlar kimlerden geliyor? Bir İngiliz ne kadar Angl, ne kadar Sakson? Bir Alman ne kadar Germen, ne kadar Ari? Bir Kürt ne kadar Aryan, ne kadar Hurri? İşte bütün bu soruların cevabını bize verecek olan etnoloji ve antropolojiden çok folklordur.


Folklor ürünleri arasında yer alan destanlar, masallar halkın 'anatomik' yapısını en çok içeren unsurlardır. *Kalevala Destanı* bize Finller hakkında ne kadar ipucu sunuyorsa, *Grimm Masalları* Almanlar, *Andersen Masalları* da Danimarkalılar hakkında o kadar veri sunar.

Anabasis'in *Onbinlerin Dönüşü*'nde anlatıldığı, en modern silahlarla kuşanmış paralı Yunan askerlerini, Kürt dağlarından Karadenize inerken,



Celil ailesi; bir kültür ocağı

Fotoğraf: Şenay Kumuz



sapanla püskürtenlerin Kurt olduğu güclü bir kabul görür bugün. Aynı şekilde Kürtlerin kökenlerinin Hurri, Mittani, Kassit, Med gibi uygarlıklara dayandığı da bir başka güclü faraziyedir. Bu ve benzeri ipuçlarına bakılarak bir halka ilişkin aşağı yukarı bir fikir sahibi olunabilir. Ancak bir halkı gerçek anlamda tanımamızı sağlayacak en değerli vesikalar, o halkın ürettiği folklor ürünleri, destanlar, masallardır yine de. Sözelimi Kürtler Firdevsi'nin Şehnamesi'nde de yer alan *Demirci Kawa Destani*'na inanır, *Kawa Destani*'nda kendilerini bulur, sonra masallarda kendi kokularını, renklerini, özlemlerini, düşlerini...

Bir hayalin peşinden bir ömür

Avusturya'da Viyana Üniversitesi Bilimler Akademisi'nde öğretim üyesi olarak görev yapan Celilê Celil, ilerleyen yaşına rağmen halen Kürtlerin yaşadığı yerleri adım adım dolaşarak bugüne kadar gün yüzüne çıkmamış Kurt masallarını derleyip sunmaya çalışmaktadır. Ömür payına sürgünde yaşamak düşen ve en büyük hayali yeryüzünde ne kadar Kurt masali varsa bunları derlemek olan bu ak saçlı bilge, ısrarla hayalinin peşinden yol almaya devam ediyor.

Celilê Celil, 1955'te Ermenistan Radyosu'nda başlayan Kürtçe yayının kurucusu ve ilk sorum-

lusu Casimê Celil'in Ordixanê Celil, Cemila Celil ve Zina Celil'le birlikte dört çocuğundan biri.

Kurt entelijansyasının ilk akla gelen isimlerinden olan ve Kurt dili, edebiyatı ve folkloruna büyük hizmetleri olan Celil ailesinin en çalışkan üyesi Profesör Celilê Celil'in Viyana'da kurduğu Casimê Celil Kurt Kütüphanesi; Kurt sözlü kültürü, edebiyatı, şarkısı ve ezgileri vb. alanlarda, Kurtçe radyo yayınları dönemleri dahil olmak üzere pek çok derlemenin ve çalışmanın yapıldığı ve Celil ailesi üyelerince arşivlenmiş çok değerli bir kaynak merkezi durumunda.

Kurdoloji çalışmalarında Rusça ve Ermenice kaynaklardan yararlanan, Kurtçe radyo yayınları sürecinde oluşan arşivleri inceleyen; Kurt sözlü edebiyatı ve kültürune ilişkin derlemeğer üzerinde derinlemesine incelemeler yapan Celilê Celil'in Kurt sözlü edebiyatına katkıları her türlü takdire değer.

Çoğunluğu Ezidi, bir kısmı Müslüman olan ve Ermenistan'da Erivan ve çevresinde yaşayan Kürtlerin önemli bir bölümü 1918'de Kars ve çevresinden göç etmek zorunda bırakılmış. Tam da bu tarihte Kars'ın Digor ilçesinin Kızılküle köyünden kaçarken annesini, babasını ve diğer aile üyelerini kaybeden, öksüz ve yetimler jenerasyonundan ve yetimhanede büyümüş

Casimê Celil'in oğlu olan Celilê Celil, 1936'da Erivan'da doğdu. 1959'da Erivan Devlet Üniversitesi Tarih Fakültesi'ni, 1962'de Leningrad Doğu Bilimleri Enstitüsü'nde asistanlık eğitimimini bitirdi. 1963'te 1850-1880 Yılları Arasında Kürtlerin Özgürlik Mücadelesi konulu asistanlık tezini verdi. 1991 yılında ise *Osmanlı İmparatorluğunda Kürt Özgürlük Hareketinin Gelişimi* hakkındaki doktorasını tamamladı.

Celilê Celil; *Kürt İsyanları* (1966), *Kürt Folkloru* (1978) *Kürtlerin Fikir ve Siyasi Hayatı* (1985), *Kürt Masal ve Efsaneleri* (1989), *Suriye Kürtlemanın Folkloru* (1989), XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler (1992), *Kürt Destanları* (1994), *Abdürrazzak Bedirhan'ın Otobiyografisi* (1999), *Şeyh Ubeydullah Nehri Ayaklanması* (2000), *Dîwaro Te Ra Dibêm Bükê Tu Guhdar Be* (2000), *Siyapûş Seyfilmulük* (2000), *Kürt Aydınlanması* (2001), *Rûpelên Balkêş Ji Dîroka Kurd* (2002), *Keşkula Kurmancî* (2004) gibi Kürt tarihi, kültürü ve folklorunu konu alan yetmişin üzerinde kitap, makale ve bildirge yazdı. Kitap ve makalelerinin çoğunun İsviçre, İsviçre, Irak, Türkiye, Suriye ve Lübnan'da çevirisi yapılarak basıldı. Irak Bilimler Akademisi fahri üyesi, PEN Kulübü ve Ermeni Yazarlar Birliği üyesi olan Profesör Celilê Celil, uluslararası ve yerel konferans ve sempozyumların da aktif katılımcısıdır.

Meyvelerinden herkes tatmalı

Gerçek bir akademisyen ve düşünür olan bu ak saçılı bilgleyle 1990'lı yılların sonrasında tanıma olanağı bulmuştum. O yıllarda Kürt literatürü üzerindeki sansür görece sona erince Kürt tarihine duydum ilgi nedeniyle Kürdolojiye ilişkin ne kadar kaynak varsa edinmiş, en büyük tutkum olan şaire ve edebiyata uzunca bir süre ara vererek Kürdoloji okumalarına vermiştim kendimi. Bu konuda ilk okuduğum kitap Nikitin'in *Kürtler adlı çalışmasıydı*. Yıllar sonra bu kitabın Fransızcadan çevirisinin Cemal Süreya tarafından yapıldığını öğrendiğimde çok şaşırmıştım. İşte bu ilk dönem okumalarımda okuduğum ikinci kitap Celilê Celil'in Özge Yayınlarından çıkışmış olan XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler adlı çalışmasıydı. Çok iyi bir araştırmaya dayalı olan bu akademik çalışmanın aynı zamanda şıirsel bir anlatıma sahip olması beni çok etkilemişti.

O sıra Kürt tarihine fazlaıyla yoğunlaşlığımdan Kürt tarihine ilişkin bir roman yazma fikri de kafamda filizlenmeye başlamıştı. Bu dönemdeki tutkulu okumalarım gitgide *Bir Cudi Söylencesi* romanımın kurgusunun da kafamda şekillenmesini sağladı. 1999'da başladığım ve 2002'de tamamladığım bu ilk romanımı yazmamdaki en büyük motivasyonlardan biri Celilê Celil'in bu kitabının bende yarattığı etki oldu.

Ta o zamanlardan hayranlık duyduğum Celilê Celil'le aradan yaklaşık 15 yıl geçtikten sonra ilk kez Van'da karşılaştık. Ben Cezaevinde Gelişen Edebiyat, Celilê Celil ise Kürt Masalları üzerine bir söyleşi yapmak üzere edebiyat festivaline davet edilmişistik. Beni ağırlayan mihmandar, Van gezimizde bize bir ismin daha eşlik edeceğini ve bunun Celilê Celil olduğunu söylediğinde sevincime diyecek yoktu. O ilk karşılaşmamızda büyük bir muhabbetle kucaklıklık birbirimizi. Birkaç gün içinde yaptığımız sohbetler ona olan hayranlığını bir kat daha artırdı.

Perspektifinden, çizgisinden pek hazzetmemekle birlikte, İlber Ortaylı'nın Türk kültür ve tarih birikimini kendine özgü ıslubuya aktarışına hayranlığım vardır. Celilê Celil'i ona benzetirim çok, hem Kürt kültürü ve tarihi üzerine birikimi, derinliği hem de bunu gerek sözlü gerek yazılı çok güzel bir ıslupla anlatışıyla.


Celilê Celil yaşayan bir tarih, bir kültür aacı. Onun meyvelerinden herkes tatmalı.




Amedspor kitabıyla 'Kürt futbolu'nu yazan Ali Fikri Işık:

► Mağduriyet enerjimizin ürünüdür AMEDSPOR

Röportaj: KEJÊ BEMAL



Şevket Süreyya'nın bir paragrafyla geçiştirdiği olaylar sırasında; İstanbul'da mevcut 75 Rum kilisesinden 73'ü, 8 Ayazma, ikisi Manastır, bir sinegog, 26 okul, aralarında otel, lokanta, fabrikanın olduğu 5 bin 538 gayrimenkul tahrif edildi. Saldırılar eş zamanlı olarak İstanbul'da Rumların yoğun olarak yaşadığı bütün semtlere yayıldı. Adalar'a motorla gidilerek yağma ve saldırular burada da sürdürülüdü. Saldırılarda 15 kişi hayatını kaybetti. Onlarca kadın tecavüze uğradı. Papazlar sünnet edildi, azınlıklara ait mallar yağmalandı. Anadolu'nun pek çok kasabasından taşıma kitalar önceden işaretlenmiş ev ve dükkanlara saldırdı.

Şevket Süreyya Aydemir, Meclis tartışmaları sırasında, Meclis Başkanı Refik Koraltan'ın "hükümeti kurtarmak" için bulduğu sorumlu tanıdıktır. Bundan sonra yıllar yılı pek çok benzer olayda aynı söz söylenecektir: "Bu karışıklıkları Komünistlerin çıktırdığı anlaşılmıştır!"

Sorumlu tespit edilmiştir ama ortada komünist yoktur! Onları bulma görevi de MİT ve Emniyet Siyasi Şube'nindir. Siyasi Şube'nin hazırladığı liste doğrultusunda operasyonlar yapılır. Listedeki isimlerden askerde olan da vardır, ölmüş olan da!

Behice Boran'la birlikte Türkiye İşçi Partisi'nin uzun yıllar yöneticiliğini yapan Dr. Nihat Sargin da (1927-2010), TÜSTAV Yayınları'ndan çıkan Cezaevi Anıları'nda, 6-7 Eylül'e dair ayrıntılı değerlendirmeler yapar. Sargin, olaylar sırasında Osmanbey'de-



ki evinden hiç çıktıdığını, bunun pek çok tanıtı olduğunu ancak "sorumlu" arayanlar için bunun bir önemi olmadığını zamanla anladığını yazar.

Aylarca cezaevinde tutulduklarını söyleyen Nihat Sargin, "Harbiye Cezaevi'nde tutulan 44 kişinin büyük çoğunluğu mahkemeye bile çıkarılmadan 4 ay sonra serbest bırakıldı, birkaç kişi mahkemedede yargılanı ama onlar da bir zaman sonra tahliye ve beraat ettiler" diyecektir.

Sargin, "salkım salkım" idamlarından söz edildikleri böylesi bir suçtan nasıl serbest bırakıldıkları sorusunun yanıtını verirken, "kendilerini 'kahraman' olarak gören yakma yıkma ekiplerinin, (ki esas olarak DP kadrolarıdır) bu kahramanlıklarının "komünistlere" mal edilmesinden duydukları rahatsızlığı yüksek sesle, homurdanarak belli etmeleri..."nden de söz etmektedir!

Güz Sancısı ve kışkırtılan 'Gurbet Kuşları'

Yılmaz Karakoyunlu aynı isimle sinemaya uyarlanan Güz Sancısı romanında, Asmalı Mescit Sokağında genç ve güzel Rum kızı Ester'in hikâyesini konu eder. Babanne, Hacı Kamil Efendi, Madam Rhea, Emirdağlı, Nemika ve Konya'dan tip

okumak için İstanbul'a gelmiş olan yakışıklı Behçet'in 6-7 Eylül Olayları sırasında kesişen hayatlarıdır, anlatılan. Olayların İstanbul'un çok kültürlü hayatına önemli bir darbe vurduğunu anlatan Karakoyunlu, yaşınları "sermayenin değişimi" olgusunda değerlendirdir. Ülkeden gidenlerin yerine kentlere gelenlerin "kültürsüz" insanlar olduğu eleştirisini yapar ve olayların arkasında iktidarın olduğunu söyler. 6-7 Eylül'ü halkın belleğine taşıyan kitaplardan biridir Güz Sancısı.

Kitap, Etyen Mahçupyan ve Nilgün Öneş'in senaryosuyla sinemaya da uyarlanacaktır.

Orhan Kemal, Anadolu'dan İstanbul'a göç olgusunu konu ettiği Gurbet Kuşları romanında, Demokrat Parti iktidarının 1950'lerin ortasından itibaren giderek partizan bir tutum izlemeye başladığını tespit eder. Gurbet Kuşları'nda, hızlı bir biçimde "parti devletine" giden DP iktidarının, İstanbul'a çalışmak için gelen ve inşaatlarda yapım, yıkım işlerinde çalışan Anadolu köylülerinin barındığı Küçükpaşar semtindeki hanlarda kalan işçileri de kışkırtarak harekete geçirmiş olduğu tespit edilir.



Orhan Kemal, bu hanlardan birinde babası ile birlikte

kalmakta olan Kastamonulu işçiye anlatır, 6-7 Eylül'ü...

"Millet kıyamet günü gibi ayaktadır, polisler saldırgan kalabalıkları engellemek surda dursun, 'arka' olmaktadır. Dükkan kepenkleri mukavva gibi yırtılmakta, o korkak, o en zayıf insanlar sanki 'yedi başlı dev' olmuş gibidir. Koca buzdolapları, avizeler, top top kumaşlar, tabaklar, sürahiler..."

Şu bastıkları kaldırmalar yok mu?.. bütün, ipekli, yünlü serili... Bütün Beyoğlu'nu sarmış bir uğultu, gürültü... İstanbul çığlık çığlık, İstanbul alev alev... Herkes Beyoğlu'nda, bu talandan, bu yıkımdan bir şeyle kapma peşinde... Radyolar dolusu tahrik, radyolar dolusu, köpük köpük heyecan insanların kanını alev alev, bayrak bayrak coşturmuş, Türk milleti Ortaçağ'dan bile önceki vandalizmin "tahrip" şuuruna itilmişti. İstanbul yaktırılıyor, yaktırılıyor, yağma ettiriliyor...

Ortaçağ ve ondan öncesinin karanlıkları öne çıkmış, dönen gözlerin salladığı kazmalar İstanbul'u, belki de yüzüllar boyu utanç verebilecek bir şuruzlukla yıktırıyordu. İstanbul beş yüz yıl önceki Fatih Sultan Mehmet'in askerlerinin ayakları altında kalmışçasına alev alev haykırıyordu...



Orhan Kemal de DP'nin yarattığı asalak müteahhitler, taşeronlar, köşeyi dönmeye çalışan komisyoncular, devleti ve halkı soyarak milyoner olmakhevindenki insanlar aracılığıyla sermayenin el değiştirmesinin bir parçası olarak değerlendirir, 6-7 Eylül Olayları'ni.

Tankın altında bir cesettir Hulki Bey!

Kırk yıllık uzun bir aradan sonra güçlü romanlarla edebiyata yeniden dönen Yiğit Okur'un (1934-2016) yayınlanan ilk romanı *Hulki Bey ve Arkadaşları*'nın kurgusunda '6-7 Eylül Olayları' önemli yer tutar.

Romanın temel karakteri Hulki Bey, 6 Eylül akşamı koltuğunda *Le Monde*, Tünel Meydanı'na iner. Caddeye doğru yürür ama iki kamyon Markiz Pastanesi'nin önünde yolu tikamıştır. Hulki Bey kalabalığın hep bir ağızdan bağırdığı sözleri duyar.

"*Kıbrıs Türk'tür, Türk Kalcaktır... Rumlar puştтур, puşt kalacaklardır...*"

Hulki Bey ilk kez caddeye "klark" çekemeyecektir; gazeteyi cebine sokuşturur. Yüksek tavanlı odasında *Le Monde*'i okur gibi yaparken, sopalar, taşlar, tekmelerle bir dünya yıkılıp yok olacaktır. Hulki Bey'in bu sopali, taşlı adamlarla hiçbir

ilişkisi yoktur... Yuktur ama birileri, bir istekanın ucunu tebeşirleyip önündeki bilardo topuna vurmıştır. Yeşil çuhannıñ üstündeki toplar, toparlanıp dağılıp birbirine vururken birinci topun hamlesi gelip Hulki Bey'i vuracaktır...

Hulki Bey ayak uçlarında fiyakayla döner, sırtını Cadde-i Kebir'e... Yüksek Kaldırım'a yönelir. Hayır! Oranın manzarası da farklı değildir. Oradan da karanlık yüzlü adamlar, kümeler halinde ellerinde sopalarla Tünel Meydanı'na tırmanmakta, bağırmaktadırlar. "Ya taksim, ya ölüm!.."

Hulki Bey, sevgilisi Katya'nın evine gider. Bir süre sonra Katya'nın babasının dükkânı Paradisos'un yakıldığı haberini alırlar. Haberi veren Andon, yandaki manavdan Türk bayrağı istemiş ancak manav bayrağı vermemiştir. Katya evden fırlar, Hulki Bey de peşinden. Ağa Camii'nin önünde yakalar Katya'yı. Karşılmasına çıkan polisle kavgasında yere düşer. O sırada bir tank manevra yapmaktadır. Cam parçaları, yırtılmış iç çamaşırıları, savrulmuş kunduralalar, çaput olmuş kumaşlarla dolu, dağılmış, darmadağın olmuş bir caddeňin orta yerinde sırtüstü yatan bir cesettir artık Hulki Bey...

Yiğit Okur romanında, İstanbul'u bir bakireye benzetir. Başına her şey gelmiş ancak bakırdır hâlâ. Ta ki, 1955 Eylül'ün 6'ncı gecesi irzına geçilene dek!..

Fürüzan ilk kez 1999 yılında yayınlanan *Sevda Dolu Bir Yaz* isimli öyküsünde, Şemsigül Şehrazat Debrecenli adlı çocuğun gözünden anlatır, 1950'li yılların İstanbul'unu.

Güzeller güzeli Nagehan Teyze, pazar günleri torunuunu elinden tutup Beyoğlu'na gezmeye götüren bir dede, Bakırköy'deki Miltiyadi Aile Gazinosu, Beyoğlu'nda terzilik yapan dostluk abidesi Rum komşular, 6-7 Eylül Olayları ve Rum dostların küskün, kırgın, hüzünlü Yunanistan göçü...

Fürüzan, farklı din, inanç ve milliyettedeki insanların dostluğunun anlatırken, bu dostluğu sona erdiren olayların başına, 6-7 Eylül'ü koyar. Artık hiçbir şeyin eskisi gibi olması mümkün değildir. Çocuğun gözündeki "saflık", "bozulmamışlık" artık yoktur.

Ah Lena...

Vedat Türkali de (1919-2016), *Yeşilçam Dedikleri Türkiye* romanında anlatır 6-7 Eylül'ü. Talimhane'de eczanesi

olan Zühtü Bey ile Rum kızı Lena'nın ilişkisi üzerinden bir anlatımla. Lena, kalp hastaşı babası Yorgo Mavridis'in pahalı ilaçlarını alabilmek için nefret ettiği Zühtü Bey'le "yatmaktadır". Romanın son bölümlerinde, Yunanistan gezisi sırasında eskiden yattığı Lena'yı yeniden görmek ister Zühtü Bey.

Ancak, bu ziyaret sırasında, yaşıdıklarının kendisinin düşünüdüğü gibi olmadığını öğrenecektir; Lena babasının ilacını alabilmek için birlikte olmuştur onunla. Lena'nın babası da Varlık Vergisi'ni ödeyemediği için Aşkale'ye gönderilenlerdedir. Orada sağ yanına inme inmiştir.

Zühtü Bey, 6 Eylül'ü 7'sine bağlayan geceyi düşünür; azınlıkların özellikle Rumların titrediği geceyi... İstanbul saatlerce kan, ateş, duman içinde çalkalanıp durmuş, Yorgo Mavridis sizmiş, Lena, Beyoğlu'ndan gelen kapkara uğultuları, şangırtıları duydu¤a hıçkırmaktan bile korkarak büzülüp kalmıştır.

"Atatürk'ün Selanik'teki evine bomba koyan Palikarya'ya buderisin gerekli" olduğunu söyler Zühtü Bey. Ancak bir zaman sonra gerçe¤i, bomba işinin bir düzen olduğunu öğrenince, o kargaşa içinde Lena'yı iki kez ilişkiye zorlamış olduğunu, kızın öylesine isteksiz, öylesine ürkü içinde olduğunu anımsar.

Yunanistan'a göç ettikten yıllar sonra Lena, Zühtü Bey'in yüzüne karşı, eczanesinden yoksul hastalar için ilaç çaldığını, parası olmayan hastalara ilaç alabilmek için Zühtü Bey'in kalfası ile de yattığını söyleyecektir. 6-7 Eylül sonrası Türkiye'den Yunanistan'a gidenlere TÜRKOSPORE (Türk

tohumu) diyorlar. Zühtü Bey Türkospore Lena'nın ne güzel reçeller, likörler yaptığı düşünür. Paskalya çörekleri, çam fistıklı ayva ezmesi, kurabiye, pastalar, reçeller, vişne, gül, karışık meyve likörleri... Ah Lena ah...

Had aşılmadı, 'hat' oluşturuldu!

Şubat 2018'de yayınlanan, İsmail Güzelsoy'un *Hatırla* romanında, '6-7 Eylül Olayları' zaman belirtildeden anlatılır.

Suzan ile Samet Kars'tan kalkan bir trenle İstanbul'a gelmişlerdir. Köpekleriyle insanı parçalatan zalm bir validen kaçmaktadır, Suzan. Samet ona yardım eder. Beyoğlu'na Suzan'a giyerek bir şeyler almak için giderken bindikleri dolmuş birbiri ardına dizilmiş kamyonlar nedeniyle ilerleyemez. Kalabalık, Atatürk'ün Selanik'teki evinin bombalandığı iddiasıyla ellerinde demir çubuklar, sopalar, balyozlar taşıyarak nümayiş yapmaktadır. Samet ile Suzan araçtan inip yürüyerek Beyoğlu'na ulaşmaya çalışır. Kalabalık, geçtiği her yeri parçalayan bir sürüngen gibidir. Yazar, karanlık bir buluta benzetir saldırganları.

Kalabalıktan birileri, köşedeki kilisenin bahçesinde toplanmıştır; şişman, kırmızı yanaklı bir adam kilisenin yaşılı papazını kucağına oturtmuş, avci yeleği giymiş biri de önüne çömelmiştir.

Avcı yeleği giyen adam başını seyredenlere çevirip bakar ve "Keseyim mi kökten? Tam sünnet olsun, çift dikiş" der. Yaşılı papaz bağırıp yalvarmaktadır. O sırada kilisenin kapısının önüne biri koşarak gelir, "Bul-

dum" diye bağırrı. Elinde iri bir makas vardır. Kel, kaytan bıyıklı bir adam makası alır, papazın sakalını, bıyığını, saçlarını kesmeye başlar, bu arada avci giysili adam, "Tamamdır, sen de bizdensin" diye kahkaha atarak ayağa kalkar, yanakları ve gömleği kan içinde kalmıştır. Papaz acıyla kırınmaktadır, inleye inleye bayılan papazın taşakları kesilmiştir. Seyreden insanlar tezahürat yapmakta, çığlık atmaktadır...

Bu arada iki kişi kilisedeki Isa heykelinin dibine sıçmaktadır; ikonlar, heykeller, avizeler parçalanmıştır. Avcı yelekli adam, "Durun lan! Perakende iş yapmayalım, yakalım gitsin!" der. Elindeki meşale ile parçalanan yüz yıllık ahşapları tutuştur...

Suzan yerlerde bayın yatmaktadır, üzerinde, iri bir herif tepinmektedir. Arkadaki bir adam bağırrı: "Kaynak yapmak yok, herkes sırasını beklesin!" Bütün bu olaylar sırasında devlet güçleri seyircidir, hatta köprüyü kapatır; bunun anlamı, daha çok insan ölsün, daha çok kadına tecavüz edilsin, daha çok mala zarar verilsindir...

İsmail Güzelsoy'un anlattıkları, 6-7 Eylül'de "haddin aşıldığı" söyleminin gerçek olmadığını, bu sözün, bütün bu saldıruları planlayan, organize eden, uygulanan iktidarın kendini kurtarmak için uydurduğu bir "masal" olduğunu doğrular.

6-7 Eylül pogromu, "kardeş halklar" söyleminin karşılığının pek olmadığını, yıllar yollar sonra Türkçe tarafından telafuz edilen "ne mozayıgi ulan, mermer, mermer!" söyleminin köşetaşlarının döşendi¤i bir dönümdür.

Edebiyata yansaması da önemli ölçüde bu eksendedir. ♪



► Warê Zeus

FIRAT CEWERÎ



Ev serê du hefteyan e ez li Atînayê me. Ez ê hê du hefteyên din jî li vir bimînim. Cara pêşî ez di sala 1994an de hatibûm Atînayê, lê bi tenê şevekê lê razabûm. Dûre em bi çarsed nivîskarêni ji sih welatên cihê bi keştiyekê derketibûn rêuwiya Deryaya Reş. Ew ger ji aliyê Yekîtiya Nivîskarêni Swêdê û bi alîkariya Yekîtiyên Nivîskaran yên çend welatên din hatibû lidarxistin. Armanca gerê azadiya fîkrê û bilindkirina dengê diyalogê bû. Min ew gera xwe mîna kitêbekê bi navê "Pêlêن Deryaya Reş" nivîsand.

Ez niha, dîsa mîvanê Yekîtiya Nivîskarêni Swêdê me, ango Yekîtiya Nivîskarêni Swêdê ji bo nivîsandinê bûrseke yekmehî daye min û ez li Atînayê, li mala Ariane Wahlgren im. Ariane Wahlgren bi xwe cihûyeke

alman bû. Wê di sala 1937an de, di nozdeh saliya xwe de koçî Swêdê kiribû û piştî bi salan li Atînayê bi cih bûbû. Gava di 21ê nîsana 1967an de di bin serokatiya Georgios Papadopoulos eskeran li Yunanistanê dest danîbûn ser hukum, gelek yunan di îşkenceyên nedîtî re derbas bûbûn û gelekan jî koçî welatên Ewrûpayê kiribûn. Hingî Ariane Wahlgren li Atînayê bû û ji radyoya Swêdê re nûçe ji Yunanistanê digihandin guhdarêni Swêdê. Mala wê wek "The Swedish house" dihat bi nav kirin û hê jî li vê herêmê wiyo tê naskirin. Wê ji xwe re li Atînayê der û doreke fireh çêki-ribû û gelek swêdî û rojnamevanê swêdî yên ku riya wan bi Atînayê diketin, seriye didan Arianeyê. Gava Ariane Wahlgren di sala 1993an de mir, wê di wesiyetnameya xwe de xa-

niyê xwe ji karkerêni kulturê re hişt. Yekîtiya Nivîskarêni Swêdê dest avêt vê malê û ew iro bi Yekîtiya Rojnamevanêni Swêdê re xwedîtiyê lê dike. Loma ew bûrsan didin endamên xwe. Bûrsêni Mala Ariane Wahlgren yên Atînayê ji bo nivîskaran mehek, ji bo rojnamevanan jî du hefte ne.

Anîha meha nîsanê ye, ez li mala wê me û bi kurdî romanekî dinivîsînim. Mala wê li Atînayê, li jêra Akropolîsê, nêzîkî mala Mikis Theodorakis e. An mirov li ber derî bi çend pêlikan bi hewa bikeve, an jî mirov li terasa wê rûnê, Akropolîs bi heybet û spehîtiya xwe derdiikeve pêşberî mirov. Lê ji ber ku Akropolîs li serê çiyayekî hatiye avakirin û avahî jî ji newalê ber bi çiyê ve hatine lêkirin, heta ku mirov ji jêr ve xwe bi pêlikan digihîne mala



Arianeyê mirov di xwêdanê de dimîne. Digel ku ez ne ciga-rekêş im jî, dîsa heta ez xwe digihînim malê ez bêhnçikiyayî dibim. Li ber deriyê vê malê dareke hijirê şaxên xwe ber-dane û çend guliyêن wê jî xwe bi ser deriyê hewşê de tewan-dine. Hijiran avêtine darê lê hîn kerik in. Gava mirov deriyê hewşê vedike û dikeve hundir, dareke lîmonê bixêrhatinîyê dide mirov. Hey ez nikarim lî-monan bixwim, lê xuya ye berî hijir bigihêن û ez wan bixwim, wê dema min biqede û divê ez vejerim.

Hevşibiya kurd û yunanan

Herçiqas ez nikaribim ji hijira li ber derî bixwim jî, lê ez têra xwe zeytûnan û gelek celebêن zeytûnan dixwim. Yunanistan bi zeyt û zeytûnan xwe nav-

dar e. Ji ber ku ez jî zarokê deveke bi zeytûn im, ez bi zeytûnan mezin bûme, hem jî bi zeytûnen Dêrika Çiyayê Mazî mezin bûme, loma ez qîma xwe bi her celebê zeytûnan naynim. Lê baş e ku li Atînayê celebêن zeytûnan pir in û ez dikarim hilbijêrim. Darên zeytûnan temendirêj in û her tim kesk in. Li Yunanistanê hê ji dema antîkê ve zeytûn navdar in. Dibêjin Xwedaya parastina Atînayê, Atêna darên zeytûnan anîne Atînayê.

Ez niha ne di dema antîkê de me, lê ez di siya wê de dijîm. Ez gava xwe davêjim ku ber-mayêن antîkê ne. Di vê dem-salê de Atînaya îro jî xweş e; avahiyêن wê, café û restoranêن wê û şenîyêن wê... Ji xwe gava ez piştî xebata çend saetan derdikevim meşê, ez jî darên wê yêن porteqlan re heyran

dimînim. Li piraniya kuçe û kolanêن Atînayê, li vî alî û wî aliyê rê bi rêsê darên porteqlan hene. Niha tam dema wan e, porteqlan avêtine daran û ew bi rengên xwe yêن por-teqâlî di nav keskahiya daran de pir spehî xuya dikin. Digel ku ez jî porteqlan hez dikim jî, lê gelek caran ji ber zehme-tiya qeşartina wan, ez xwe ji wan dûr digirim. Lê qeşartina porteqlanen Atînayê ewqasî hêsan e ku tu dibêjî qey tu mandarînekê diqeşêri. Welê bawer mekin, ku ez porteqlan ji daran dikim û dixwim, na, ji ber ku ev du hefte ne ez li Atînayê me, min hê nedîtiye rojekê yek xwe dirêjî darekê bike û porteqalekê jêbike. Ez carina dibînim porteqalek ji darê dikeve û heta jêr digindire. Bi awira pêşî mirov dibêjî qey ew jî wek çelekêن Hindistanê

pîroz in. Lê na, kulturek e, kes li xwe danayne û destdirêjiya porteqalekê nake. Ez jî di nav vê kulturê de dihelim, bi gotineke din ez wenda dibim. Digel ku ev demeke dirêj e li Swêdê dijîm jî, lê ez lê wenda nebûme, herkes zanin ez ne swêdî me. Li Atînayê kes nizanin ez ne yunanî me. Ez bi ku de diçim ew bi yunanî bi min re dipeyivin. Gava ez bi îngilîzî bersiva wan didim, ew ecêbmâyî dimînîn û dibêjin ez pir dişibim yunanan. Heta wê rojê, ji bo ez li metroyê siwar bibim min jî xwe re bilêtek dikirî, min dît jî nişkê ve yekî xwe avêt min, min di dilê xwe de got, aha va ye ez li kurdekkî rast hatim, lê gava ez lê zîvirîm, mîrik bi yunanî bû bilebila wî û diyar bû ji bo ez şibandibûm hevaledî xwe uzra xwe ji min dixwest.

Em bi gelemerî ji aliyê fizîkî neşibin hev jî qedera me yek bûye, derdê me yek, armanca me wek hev e. Ew miletêkî qedîm in, em jî xwe qedîm dihesibînin. Qedîmbûna wan bi belge, mîmarî û nîvîskî gihîştiye roja me, ya me ji ber ku nehatiye nîvîsandin, an jî hatiye talankirin, loma wenda bûye. Ew bi meraq bûn, loma difikirîn, encama fîkrê ew bi ser keşifan ve dikirin. Berî bi 2500 salan gava li gelek deverên dînyayê xelk li starekê digeriyan û li dû têrkirina zikên xwe bûn, medeniyeta grekiyan gihîştibû radeyeke bilind. Wan bajar ava kiribûn, bingehê demokrasiyê avêtibûn, ticaret li dar xistibûn, huner û edebiyat bi cih kiribûn, teatroyê mezin ava kiribûn, alim û filozof derxistibûn.

Navê demokrasiyê jî Atînayê derketiye, cara pêşî bingehê

demokrasiyê li Atînayê hatiye avêtin, demokrasî li Atînayê hatiye ceribandin. Digel ku Xwedaya parastinê ya Atînayê jin bû jî, lê mixabin di demokrasiya Atînayê de mafê jinê û dengdanê tunebû. Herweha mafê kole û biyaniyan jî tunebû ku dengê xwe bidana û besdarî li demokrasiya Atînayê bikirana. Tenê mafê zilamên Atînayê yên di ser bîst salî re hebû. Perikles (460-430 berî Isa) serokê Atînayê yên xwedî desthildariyeye mezin bû.

Atînaya iro jî demokratik e, lê jinê Atînayî ne di hundiran de ne, ew bi her awayî besdarî li civatê dikan, mafêwan û dengdanê hene û li Atînayê xwediyê desthilatdariyeye mezin in. Seroka belediya Atînayê jin e; yên ku li bajêr li ber çavan dikevin, yên café û restoran dadigirin, yên bi refan dikevin hundirê dikanê kincan û jê derdi Kevin, yên bi bêhnêne xweş û bi livênerotik di ber mirov re dibuhurin her keç û jin in.

Deverên tarîxî yên antîk li Atînayê


Her jin bû ya ku Atînaya Antîk jî diparast. Hingî ji bo Xwedayan dema avakirina ibadetgeh an jî dema avakirina malên Xwedayan bû. Ji bo avakirina ibadetgehêne mezin, bixemîl û spehî bajarê Greklandê bi hev re ketibûn qayışê. Avakirina ibadetgehêne welê bi salan diajotin, carina heta deh û bîst salan jî dewam dikirin. Wan bi stûnên qalind û bilind yên jî mermer avahiyêni bi heybet ava dikirin û hêkelê Xwedayeckî/Xwedayekê tê de bi cih dikirin. İbadetgeha Panthenonê

ya li serê çiyayê Akropolisê hatiye avakirin, hem di dema antîkê de Atîna dixemiland, hem jî iro Atînayê dixemîline. Ew bûye sembola Atînayê û li Akropolisê ibadetgeha herî mezin e. Ew ji bo Xwedaya Atînayê, Atêna hatibû avakirin û hêkelekî Atînayê yên mezin ku ji aliyê hêkeltraş Fidias ve hatibû çêkirin li Parthenonê hatibû bicikirin. Hema bêje hemû stûnên vê avahiyâ bermaya antîkê hê jî mane û ya ku li Atînayê pêşî li ber çavêni mirov dikeve ev avahî ye.

Hefteya pêşî ya meha nîsanê gava ez hatim Atînayê, ez du caran bi çiyayê Akropolisê ve bi hewa ketim û li van avahiyêni bi heybet geriyam. Ji xwe heke riya mirov bi Atînayê bikeve û mirov neçe seredana Akropolisê wek mirov here Hecê lê nêzîkî kevirê Kehbê nebe. Mirov jî ser serê Akropolisê ji her çar aliyan ve hemû bajarê Atînayê dibîne. Hiske pir xweş e, mirov bilind e, nêzîkî Xwedayan e.

Ez ji teatroya Dionisos bi Akropolisê bi hewa dikevîm. Dionisos teatroyeke kevin e, berî Isa di salên 300î de di pala Akropolisê de hatibû avakirin. Li vê teatroyê lîstikên Sofokles, Eurupîdes û yên hevdemên wan hatine lîstin. Hê jî gelek ji bermayêni vê teatroyê mane. Bi taybetî dika wê ya ku mirov jî jor ve dibîne û kursiyêne rêza pêşî ku mîna qoltixan bi rêzene, lê ji mermer û neqîşandîne pir balkêş in. Ez li rêza pêş rûnanîm û hildikişim rêza dawiyê, bîstikekê rûdînim, dema antîkê bi bîr tînim, lîstikvanan di serê xwe de zindî dikim, temâsevanan tînim ber

çavêن xwe û bi heyranî ji wir radim û diçim serê Akropolisê. Piştî ez tibabekî li ser serê Akropolisê dimînim, diçim vî alî û wî aliyî, dikevîm hundirê mu-zexaneya li jora Akropolisê ya ku gelek hêkelên xweda û qeh-remanên Atînayê lê hene, dûre dadikevîm bazarê ango Ago-rayê. Di dema antîkê de Agora pir bedew hatibû avakirin, cihê minaqeşê û dan û standina fikir û siyasetê bû. Sokrates û Platon gelek caran li wir rûniştibûn û minaqeşê kiribûn. Ez diçim li ser benda wan ya ji mermer rûdinêm. Ez di xeyalan de kûr diçim û dema antîkê, dema minaqeşeyen wan li ber çavên min zindî dibe. Ez li diyalogên Platon difikirim, vexwarina tasa jehrê ya Sokrates tê ber çavên min. Ez ji wir radibim û diçim ber zîndan, an ji şikefta filozofê herdemî Sokrates. Sokrates ne siyasetvan bû, nivî-sandina wî ji tunebû, lê bi meraq bû, dipirsî, ji bersivan pirsên nû derdixistin, ew pirs şîrove dikirin, li ser çilobûn û çawabûna wan diket fikrên kûr û ew fikir dîsa davêt mazata fikrê, ji nû ve didan minaqeşekirin û dixwest jê encamekê bi dest bixe. Wî bi zîrektiya xwe gelek hewarî û şagirt li dora xwe civandibûn. Yek ji şagirtên wî Platon bû. Platon fikrên wî ji nû ve nivîsandine, diyalogên ku wî bi devkî bi atînayîyan re dikirin nivîsandine û xweparastina wî xistiye ser kaxezê. Gava desthilatdariya Atînayê dibîne ku roj bi roj hejmara hezkirêن Sokrates zêde dibin û xorx we lê digirin, ew Sokra-




tes ji bo xwe wek talûkeyekê dibîne. Loma cezayekî lê dibirin, an divê ew ji Atînayê bi dûr bikeve û biçe sirgûnê, an ji jehrê vexwe û bimire. Sokrates naxwaze ji Atînayê bi dûr bikeve û here li sirgûnê bijî, ew cezayê dudan hildibijêre, tasa jehrê ji ew bi xwe vedixwe. Şagirtê wî Platon bi hosteti-yeke edebî xweparastina wî nivîsandiye û celebê vexwarina wî ya tasa jehrê pir bedew salix daye.

Piştî ez demeke dirêj li ber dergehê zîndana ku Sokrates tê de bi tasa jehrê dawî li jiyanâ xwe anîbû radiwestim, wê demê bi bîr tînim, Sokrates

di serê xwe de bi laş û gewde dikim, di xeyalêن xwe de wî dixim tevgerê, ez dûre bi xem-gînî ji wir didim rê û diçim.

Çiyayê Olîmposê û sporê olimpiyadê

Ez vê carê berê xwe bi warê Zeus ve dikim. Zeus Xwedayê Xwedayan, Xwedayê ewr û esmanan bû. Cihêن Xwedayê mezin li serê çiyayê Olimpus bûye. Xweda Zeus, jina wî Hera, Xwedayâ evînê Afrodite û Xwedayê behrê Poseidon li ser çiyayê Olimpos bûne. Lê ez niha, li Atînayê, li ber ibadet-geha wî rawestiyame. Berî Isa bi 500 salî dest bi çêkirina



îbadetgeha Zeus hatibû kirin, lê ew piştî Isa bi 132 salan xelas bûye. Îbadetgeha Zeus ji 40x96 metreyan û ji 105 stûnan pêk hatibû. Lê niha bi tenê 15 stûn jê mane û ez destêr xwe didim her panzdehan jî.

Ez dûre xwe bera kuçeya café û restoranen didim, li cafeyeye havînî, li derve rûdinêm, aveke cemidî digel espresso yekê vedixwim û dîsa bi şopa Antîkê dikevîm. Stadiuma Kallimarmaroyê pir bala min dikîşîne. Olimpiyada pêşî li vî bajarî û li vê stadiumê çêbûye. Grekiyên berê pir guh didan spehîtiya laş û spehîtiya laşen xwe bi sporê zindî dihiştin. Tê bîra min, hê berî televizyon derkeve, berî gundi bajaran bibînin, li ba me jî xort û zilamên gundiyan di gelek şaxên cihê de spor dikirin. Bi çirê dilîstîn, bi navê dilîstîn, kevirê qawetê davêtin û gelek celebêr din ên spora bi hereket dikirin.

Li Greklandê hê berî Isa di salên 776an de ji şeref û

rûmeta Xweda Zeus re her ji çar salan carekê li Olimpiyayê di şaxên cihê de sporê olimpiyadê li dar diketin. Hingî şer radiwestîyan û ji her bajarî mirovên zîrek berê xwe didan olimpiyadan. Xelata biserketina di olimpiyadan de çıqilek ji dara zeytûnê bû, lê rûmeteke mezin bû. Beşdarên olimpiyadan yêngî ku bi ser diketin wek qehremanan li warêr xwe vedigeriyan û wek qehremanan dihatin pêşwazîkirin. Olimpiyadê modern cara pêşî di sala 1896an de li stadiuoma Kallimarmaroya Atînayê li dar ket. Herî dawiyê jî par Atînayê ji olimpiyadan re mazûbantî kir. Niha jî, min destêr xwe xistine bin çengên xwe û ez li vê stadiuoma dîrokî dinêrim. Heke ez destêr xwe ji bin çengên xwe derxim û dest bi bazdanê bikim, ez ê tu carî nikaribim carekê lê bizîvîrim. Wê tavilê bêhna min biçiye û ez ê bibêjîm tep û li erdê bikevîm. Lê ji

bo ez nekevîm, ez baz nadim, ez ji wir didim rê û bi bêhna fireh ber bi sükê dimeşim.

Ez li gelek welatan geriyame, li gelek bajarêr mezin mame, lê min bajarêr wek Atînayê hêsan nedîtine. Mirov dikare bi meşê li piraniya sük û ma-zatêr vî bajarî bigere. Hema bêje hemû li dora Akropolisê hatine avakirin. Gava carina ez dibêjîm, aha weleh ez şas çûm, hew ez dibînim ez dîsa ketim ser riya xwe ya rast. Loma, ez jî serbest digerim û niha Atînayê baş nas dikim. Hê du hefteyêr min mane û hê gelek deverêr ku divêr ez bibînim hene. Lê ez ecele nakim.

Ez êvarê xwe diezimînim restoraneke grekî. Ez bi alîkariya keçika garson li restorana ku bi dev re dagirtiye ji xwe re cihekî dibînim, bi devkenî souvlakiya digel cacixê û şûşeyeke biçûk ouzo dixwazîm, li ber buzukiya zindî ser û lingê xwe dihejînim û li kêfa xwe dinêrim. ♪



Fotoğraflar: Kemal Özer

'Hakkımızda Devlet Vermiş Fermanı'

ELİF ESER

Yaşar Kemal'in ölümsüz eseri İnce Memed'de Topal Ali'ye iz sürdürden Çukurova düzliğinde yeşeren bütün otlar, dikenler, çiçekler, yaşayan bütün canlılardır. Topal Ali'yi ve diğer kahramanları hayatımızın birer parçasına dönüştürken, 'tekmil Çukurova'yı söyle dökmüştü Yaşar Kemal. İnce Memed'i, Abdi Ağa'yı, Iraz Kadın'ı bu denli

hayatımızın içine katan şey, çakır dikenlerinin, yarpuzların, sarı sıcak bir iklimin, dağların, binbir çiçek rayihasının, insanla doğanın müthiş buluşması olarak anlatılmasıdır. Sanırım Yaşar Kemal eserlerinde insanın içine doğduğu doğayı anlatmasa ne 'Kimsecik'te Mustafa'nın Salman'dan korkusunu anlardık ne 'Bir Ada Hikâyesi'ndeki Vasilli'nin 'gü-

vercin ürkekliğini' tanırdık ne de Topal Ali'ye İnce Memed'in izini sürdürden meraklı anlardık. Moda deyimle söylesek; 'tanımak', insanın içine doğduğu doğal, iklimi anlamakla olur ancak. Dersim gibi doğası, iklimi, insanı, çiçeği, börtü böceği, zamanı, dağı, ziyaretleri, inancı, kültürü ile kendisine özgüleşmiş bir coğrafyada bu durum daha da anlam kazanıyor. An-



İam kazanıyor çünkü Dersim insanında yaşamı ve toplumsal belleği diri tutan yegâne unsur da doğa aslında. Dili, inancı ve inançsızlığı, inatçılığı, dostluğu, ihaneti bu dağlar ve sular üzeredir. Burada, insanın kendisine ve geçmişine doğru sürdürdüğü iz, bir dağ keçisinin kendiliğinden suya inen bakışında, bir kayadaki çatlaktan sızan suda, bir yılanın ağusunda, bir kekliğin kayalarda seken ötüşünde, Ana Fatma'nın, Düzgün Baba'nın, Galmem'in efsunundadır.

Önce barajlar, şimdi madenler! Nasıl Topal Ali, bir yarpuz ya da bir diken olmayınca iz süremezse biz de bizi köklerimize, acılarımıza götürün izleri kaybederiz; en son 'Munzur Milli Parkı'nda kapsayan alan için maden ruhsatı veren talancı işgale 'dur' demedikçe...

Dağa, suya, ota, yeşile, maviye, ormana, cana, canlıya düşman bir devletlî aklı yüzyıllardır Dersim'de farklı şekillerde zehur ediyor. Önce seferler, sonra barajlar, şimdi de madenler... Akan suya bakınca baraj, dağa bakınca maden gören aç gözülü ceberrut akıl, bütün hücreleştireyle burada. Fitneyi, fesadi, düşkünü, satılmıştı da yanına alarak elbette.

Bu coğrafyanın 'maden sahası' ilan edilmesinin telafisi imkânsız zararlara yol açacağını bu kararı alanlar da bilir elbette. Hem bu tehditin kapsama alanını sadece doğaya değil, insana dairdir de. İnsanın maddi-manevi yaşam alanına yönelikir. Her pinarda, her taşta, her dağda, farklı biten her ağaçta bir efsane, sürgit bir hayat vardır burada. Varlıkla, var olmakla, var olmayı korumayla ilgili bir hikâye, sözlü bir tarih... Her çiçek bir acıya açmıştır

baharını, her ağacın gölgesi bir ulunun, kutsalın ocağına düşer, dağlar bir diğer dağın kirvesi, her suyun hayatı kariştiği rahmi, bir 'masum û pakin' ve-ladeti, orman, 'utancı' bağlarında saklayan bir diyet dergâhıdır. İnsan orada önce doğanın manasında mayalanır sonra düşer ana rahmine.

Orada Xızır, cümle evliyalar, enbiyalar, veliler, üçler, beşler, on yediler, kırklar, on iki imamlar, pir u rayberler, masumlar, Şir-i haq Ali'nin düldülü bir dağın siluetine yansımıştır. Suyun canı, kurdun kuşun cümle mahlükun hakkı, o maden olarak gördüğünüz dağların koyaklarında, derinliklerinde Dersim hayatıının manası saklıdır.

Altın ve madenci sefalet!

Hayatın manasına doğru iz sürerken biz, küçük bir taş bile

böylesine ehemmiyetliyken, Urartulardan beri nerdeyse her ulus ve inancın izini taşıyan bir uygurlık alanını yok etmek istiyorlar. Doğayla böylesine hemhal olmuş bir toplumsal yaşamın kendi tabiilığı içinde yüzyılların bu talancı tahayyü-lüne direneceği açıklır. Bundandır ki, direnen toplumsallığın motivasyon kaynaklarını, belleği, hafızayı darbelemenin bir ugursuz yolu olarak yaşam alanlarındaki 'anlam'ı söküp çıkarmak istiyorlar. Doğanın talanı, 'anlam'ın talanı da oluyor. Altın ve maden vaadiyle, zenginlik hayalleriyle bilinçleri teslim alıp anlamsızlaştmaya çalışan bir sefil gerçekle karşıya şimdı Dersim.

Dersim ve Dersim kimliğine dair memleketin bir kesimine sırayet etmiş, 'öğrenilmiş' rahatsızlık ise şimdı 'Allah'ın bir lütfu'na dönüşmüş durumda. Dersim'deki orman yangınlarından bildiğimiz tepkisizlik, o malum 'terör' kıskaçından bakma tavrı, çifte standartçı algılar, ikiyüzlülük, maden faaliyeti/girişimi karşısında da pek değişmeyor. Yine diller suskun, kulaklar sağır, gözler görmüyor...

Asıl mesele...

Oysa Dersim'i de ülkedeki diğer bütün çevre saldırılara maruz kalan yerleri de kurtarmanın tek yolu tepkileri,

direnişleri birleştirmekten geçiyor. Asıl mesele, gözlere inen 'milliyetçi perdeyi' indirip doğanın her ne şekilde olursa olsun tahrip ve talan edilmesine karşı ortak bir mücadeleyi vakit geçirmeden örmektir.

Asıl mesele; Cerattepe, Salda Gölü, Kaz Dağları... ve Dersim'in aynı elin talanında olduğunu bilmekte...

Asıl mesele; Kaz Dağları'nın kurtuluşunun Dersim'den; Dersim'in kurtuluşunun Cerattepe'den geçtiğini görebilmekte...

Hülasa, asıl mesele; 'Ferman padişahın, dağlar bizimdir!' diyebilmekte... ♪



Lava Yekemîn

Ey xwedê yo
Bide min zincîra avê
Bide min qufla hirmiyê
Bide min mifta ruhê neyê
Bide min gûzana tavê

Ey xwedêyo
Newerîne gumana min li ser biharê
Neroxîne minareya min li kuçeya dostên hatî kuştin
Neşkîne awêneya şeve, awêneyê bayê, awêneyê avê

Ey xwedêyo
Bide min destê tîrêjê
Bide min rondikên tarî
Bide min malekê li kolana taveheyvê
Bide min şevezê nav hebê hinarê

Ey xwedêyo
Şîn bike heyveke din li ser vê mehsera giyayan
Şîn bike ewrekî din li ser zulmata nav dil
Şîn bike stêrkek din li ser vî terme gula baxan
Biteyisîne rojeke din ber peykerê xwînîn ê gula sor
Şîn bike... Tejî bike ji şevê... Tejî bike ji biharê vê mirinê
Şîn bike melhemekî din li ser van hemû birînan
Şîn bike erdeke din li ser van hemû zeviyêñ tırsan
Şîn bike baskeke din li ser firîna vê kevokê
Biçîne hejmareke mezintir ji bo hesabê rojêñ li wî aliyê mirinê
Bîne lênuşkeke din ji bo behsa meraqa cîhana wî aliyê mirinê

Lavaya Duyemîn

Ey xwedêyo
Ji kevokê re bêje li min bibore
Min azad bike ew
Min bibexşin ewr û stêrk
Min bibexşin roj û taveheyv

Ey xwedêyo
Bila derkevim ji xweşikî û deryayê
Bila derkevim ji perperok û xeyalê
Bila derkevim ji çemê xeqîqetê
Bila bigihêjim kulîlka nepêkan

Ey xwedêyo
Bila li min biborin ew ên ku ez ew bûm
Bila li min biborin ew ên ku ji min bûn
Bila li min biborin ew ên ku li wan cûme
Bila li min biborin ew ên kul i min hatine

Bextiyar Elî

(Ji dîwana HETA ŞINA GULÊ, HETA XWÎNA FIRISTEYÊ)
Lêanîna ji soranî: Muhsîn Ozdemîr

Yekemîn jîna kurd a ku bi kurdiya latînî nivîsiye:

►REWŞEN BEDIRXAN

EVÎN ŞIKAKÎ



Jina kurd di hemû warê jiyanê de xwedî roleke mezin û dûr û direj e. Di dîroka kurdan de gelek kesayetiyên navdar ên jin weke siyasetmedar, rewşenbîr û têkoşer navên xwe bi tîpêñ zêrîn neqîşandine. Di warê nivîsandin û edebiyata kurdî de jî gelek nimûne û ezmûnên serkeftî hene; ji ber ku nivîsandin li cem jinê ne kêmî nazdarî, dilgermî

û dilovaniya wê ye di avakirina jiyan û pêşxistina civakê de.

Di vê hejmara nû ya kovara Dilopê de em ê behsa yek ji kesen binemala Bedirxaniyan bikin ku yekemîn jîna kurd bû di kovara Hawarê de gotarêñ xwe belav dikirin: ew jî Rewşen Bedirxan e.

Rewşen Bedirxan a keça Salih Bedirxan di 11ê Tîrmeha sala 1909an de li bajarê Qeyseriyê

jî dayîk bûye. Piştî du salêni li wî bajarî malbata wê berê xwe dide bajarê Stenbolê û li wir du salan dimînin. Li Stenbolê malbata Bedirxan têñ sirgunkirin(nefikirin). Rewşen Bedirxan li gel malbata xwe berê xwe dide Şamê, paytexta Sûriyê. Li Şamê jî rewşa wan a aborî pir xirab dibe û bavê Rewşenê bê kar dimîne û ji neçarî li zindana keleha Şamê kar dike. Lê bi nexweşîyeke giran dikeve û di sala 1915an de koça dawî dike.

Piştî mirina bavê Rewşen Bedirxanê diya wê Samiya Xanim wê dişîne dibistanê. Xwendina xwe bidawî dike û diçe dibistana mamosteyan ku bi navê(Dar El Muelimîn) ango mala mamosteyan tê naskirin. Evê divistanê jî bi dawî dike. Di sala 1925an de diçe welatê Urdinê û li wir dibe berpirsa dibistana bajarê Kerekê û 3ê salan dimîne. Paşê careke din vedigere Şamê û karê xwe yê mamostatiyê heta sala 1935an didomîne.

Nivîskar û rewşenbîrê kurd ê ji Rojavayê Kurdistanê Konê Reşku yekem wan kesen li dora malbata Bedirxaniyan dişopîne û ligel wan dixebite û gelek caran serdana Rewşen Bedirxanê jî kiribû. Di van serdanan de pê re hevdîtin kiribûn û di hevdîtineka xwe de wiha dibêje: "Rewşen Bedirxan yekemîn

jina kurd e ku bi kurdîya latînî di kovara Hawarê de nivîsandiye. Yekemîn jina kurd e ku gelek xebat, bizav û çalakiyên têvel di ber kêşeya gelê xwe de li Şamê kiriye û di nav biyaniyan de dihat naskirin wek sembolek ji rewşenbîriya kurdî re."

Rewşen Bedirxan di gotarêن xwe de, di Kovara Hawarê de pirsa jinê tîne ziman û bang li jina kurd dike û bala wê dikşîne ser pêwîstiya xwendin, zanist û merifetê û wiha dibêje: "Xuşkêن min ji bilî karê malê û anîna zarakan, divê hun bi xwendinê û zanistê mijûl bin. Ji ber ku nezanî nexweşî ye û dermanê wê nexweşiyê jî zanîn û merîfet e."

Ji bilî zimanê kurdî Rewşen Bedirxan bi zimanê erebî, tirkî, farisî û îngîlîzî dizanî lê piraniya nivîsên wê bi kurdî û erebî bûn.

Nivîskara kurd Rewşen Bedirxan di sala 1935an de bi Mîr Celadet Bedirxan re dizewice û du zarokêن wê çêdibin bi navê Sînemxan û Cimşîd.

Di dema nivîsandina vê gotarê de jî min telefona Sînem Bedirxanê kir, ku niha li Hewlêre dijî, li ser diya xwe wiha got "Diya min weke pêşmergerekê bi pêñûsa xwe berevaniya doza miletê xwe dikir û têkoşîn dikir" û lê zêde kir "Hejmarek jinê Kurdistanî li Almanyayê navendek bi navê Rewşen Bedirxan vedikin." Ji dengê xuya bû ku ev yek jî cihê dilxweşîya Sînemxanê bû. Gotinêن xwe wiha bi dawî kir: "Berî niha jî li Kampa Giwêlan a penaberên Rojavayê Kurdistanê yekem navend bi navê Rewşen Bedirxan hatibû vekirin, tê de çalakiyên cuda têne lidarxistin."

Rewşen Bedirxan di sala 1934an de dibe endama Kome-



leya Yekîtiya Jinan li Sûriyê û di sala 1944an de li ser navê jinê Sûriyê, li welatê Misrê besdarî di Kongreya Jinê Cîhanê de dike. Di sala 1957an de jî û bi ala Kurdistanê besdarî di Kongreya Antî-Kolonyalîzmê de li Yewnanistanê dike.

Nivîskara kurd Rewşen Bedirxan piştî jiyanekê dûr û dirêj bi kar, xebat û xizmeta miletê xwe û bi

hejmarek berhemêن wêjeyî di 1ê Hezîrana 1992an de li bajarê Baniyasê yê ser bi parêzgeha Tertûsê ve koça dawî kir û li Şamê bi axê hat spartin.


Di gotarêن Rewşen Bedirxan de meraqa wê yekîtiya miletê kurd bû û doza kurd û Kurdistanê bû. Lewma gotinêن wê jî heta niha li ser zarê nîfşê nû têne vegotin. Em bi çend gotinêن wê dawî li nivîsê bînin:

-Kurê min, dema em hebûn hûn negihiştî bûn. İro hûn gihiştî ne lê mixabin em nemâne. Kurê min, ji hev hez bikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin kurê min, belav nebin.

-Yekêtiya kurdan bide min ez ê Kurdistanêneke azad bidim te.


-Mêrên ku qedera miletan di destê xwe de digirin li ber destê jinan xwedî dîbin. ♪

* Sînemxan Bedirxan (keça Rewşen û Celadet Elî) van fotoyan bo vê nivîsê ji albûma xwe deranî û şand.



Mehîr/Meyre

MEHMET ONCU



Sorbeya ku wekî Mehîr, Meyr/Meyre, Dowîn¹ û Garmadiyan² tê binavkirin. Xwarineke kurdan e û teva Diyarbekirê li hemû deverên Kurdistanê yên din jî tê çêkirin û bi kêfxwesi tê xwarin.

1 Bi zaravayê dimilkî (kîrmâncî) ji Meyîrê re, bi wateya ku ji dew e 'Dowîn' tê gotin.

2 Li navçeya Pîranê ji "Meyrê" re "Garmadiyan," li Erxeniyê ji "Germîya Meyîrê" tê gotin.

Ji çekirina mehîreke xweş re şarezayî divê ku pîvana kebaniyeke baş e çekirina wê. Di zargotinê de jî gelek tişt li ser vê xwarinê hatine gotin. Bav û kalan gotiye "Sê tişt xweş in bî sarî; Tirşik û Mehîr, Karî." Û her wiha di mamikekê de jî tê gotin ku "Dan û pûng û dew e, xwarineke bedew e, li sifreyê kêm nabe, tu kes ji wê têr nabe?!" Bersiv, Mehîr e.

Xwarina mehîrê, li gelek herêmên Kurdistanê li gor çej û tehmên herêmî cuda tê çekirin. Hem ji aliyê rîbazên çekirinê û hem jî ji aliyê malzemeyî ve gelek cure şorbeyên mehîrên çêkirin. Ji ber vê yekê jî ev xwarin wekî şorbe tê naskirin û zanîn, lê belê ev xwarineke sereke ye di nav xwarinên kurdan de.

Malzemeya mehîrê ya sereke, dewê kildayî û nîvîşka ku ji ser



dew hatiye hilanîn e. Dew, dan û nokên wê yên ku ji êvarê de di nav avê de maye, bixin beroşeke kûr û li êgir kin. Ji bo ku dewê mehîrê neqete heta ku dew bi kelê keve bi heskê¹ tevdin.

Mehîr, li Diyarbekirê bi nok û danê lib tê çêkirin, her wiha li gelek herêm û deveran jî mîna yê Diyarbekirê bi danê lib û nokan tê çêkirin. Lê dem hey kundiran didin ber, car caran jî li gor sewzeyên demsalê; pûng, kereng, îsotên hêşîn û balîcanêñ reş jî didin ber. Dema mehîr bi danê hêrayî tê çêkirin, bi giranî balîcanêñ reş didin ber. Lê li Licê û Farqînê bi navê "nanê ber mehîrê" û "kutilkên ber meyrê" du babet xwarinêñ ku bi mehîrê re tê çêkirin hene.

Balkêşıya mehîrê ya herî girîng, di çanda wê ya xwarin û hilanînê de ye. Mehîr, her ku dimîne wekî xwarinêñ din tehmsar nabe, her roj li çej û ekla xwe zêde dike. Taybetiyeke mehîrê ya din jî ew e ku gel, li gorî rîbazên şarezayiya

1 Hesk: Kevçiyê darînî yê mezin e.

xwe mehîr çêkirine û bi demê dirêj ev xwarin ragirtine û parastine bêyî ku xera bibe. Di demênu ku sarker (sarinc) tunebûn, ew xwarin gelek zêde çêdikirin û dixistin tûrên cawîn² û bi dîwaran ve li dar dixistin, derdanek (firaqek) datanîn binê wê heta ji avê safî dibû dadiwerivî, paşê ew tevî tûrê cawî ji bo zivistanê hildianîn. Kîngê bixwestana jî, hinek av an jî dew tev lê dikirin, tev didan û wisa mehîra xwe ji xwarinê re amade dikirin. Lê di vê serdemê de êdî ev xwarin di sarkeran de tê parastin û kîngê bixwazin li ber xwarinêñ dî tê xwarin.

Dîroka "Mehîrê" ya li Kurdistanê gelek kevn e. Kes nizane ku diroka wê digihîje kîjan demê. Lê mirov di gelek stranêñ klasîk de dibîne ku leheng "Mehîrê" dixwin û didin mîvanêñ xwe yên bi rûmet. Kebaniyê şarezayê çêkirina


2 Caw: Navê qumaşekî ji pembû û spî ye. Tûrê cawîn; tûrê ku ji ví qumaşê spî hatî çêkirinê... Ji ví tûrî re 'kîsî cawî' ji tê gotin û li gelek deveran ji xwarina Mehîrê re 'Mehîra kîsî' jî tê gotin.

Mehîrê bi rîbaza çêkirina vê şorbeyê gelek cureyên xwarinêñ dî afirandine.

Çêkirina Şorbeyê

Hêkê bişikînin û berdin binê beroşê, baş biçirpînin. Mastê xwe berdin ser hêka çîrpandî û tevîhev biçirpînin heta ku qenc li nav hev ketin. Avê berdin ser mast û baş biçirpînin. Danê xwe hilbijérin û berdin nav avdewê ku we amadekiriye û beroşê deynin ser argûnê, tevdin heta ku xwarina we bi kelê ket. Ku kel bi xwarinê ket têra wê xwey bixinê, devika beroşê nîvvekîri bihêlin û heta ku dan nerm bibe bila bikele.

Ku xwarina we hate ber çêbûnê, rûnê xwe di taweyekê de biqijîlinin, dema rûn qijîlî ji ser agir deynin (ku mirov rûnê qijilandî ji ser agir deyne û paşê nanuya xwe berde navê, nane kesk dimîne û reng û tehma sosa xwarinê xweştir dibe) û nanuya wê bixin ser rûn û berdin ser şorbeya xwe. Hûn dikarin vê xwarinê bi sarî jî û bi germî jî deynin ser sifreyê. ↗



ENVER ÖZKAHRAMAN

Mamê Ferman (Ferman Amca) korkusuz biriydi. Uzun yıllar eşkıyalık yapmışlığıvardı Hakkâri yöresinde. Asurilerden kalma dağ köyü Mêd-Arsan'da sadece karısı Porê Teyze'yle beraber yaşamıştı yıllarca. Eşkiya dedik de yanlış anlaşılması, haramı değildi o. Kimsenin malını mülkünü çalıp çırpmamış, bilakis yoksulu zengine, güçsüzü güçlüye karşı korumuştu. Varlıklıdan alıp fakire dağıtan bir eşkiya...

Ömrünün son yıllarını Hakkâri'de geçiren Mamê Ferman da gözlerine sürme çekiyordu. Özellikle yaşlı erkeklerin sürme çekmesi son yıllara kadar epeyce yaygındı. Dağlık alanlarda, yaylalarda edilmiş, insanları çeşitli zararlı işinlardan koruduğu tecrübe edilmiş bir alışkanlığı sürme çekmek.

Mamê Ferman'daki gibi kat kat gömlekler giymek de güneşten ve sıcaktan korunmanın bir yoluydu. Hakkâri'deki fotoğrafçılık yıllarda ağanın biri gelip fotoğrafını çekirmiştir. Fotoğrafı itina ile rötuşladım. Büyükları yukarı doğru kıvırtıp kaşlarıyla birlikte siyaha boyadım. Kürtler kara kaş, kara bıyığı severlerdi çünkü.

Birkaç gün sonra geldiğinde çerçeveli fotoğrafını görünce, "niç niç niç" yaptı ve şöyle dedi:

"Eline sağlık Enver Usta; yüzüm gözüm çok güzel olmuş ama fotoğrafı hiç beğenmedim."

Şaşırılmıştım:

"Niye beğenmediniz ki ağam?"

"Ee, o gün üzerimde 4 gömlek vardı, üçü görünüyor ama biri görünmüyord," demişti.


Böyle işte; 'itibarin' da 'zenginliğin' de şimdilerde fink atan 4x4 jiplerle değil de 4 gömlekle de edilebildiği güzel zamanlardı.

Belki yoksul ama güzel; Mamê Ferman'lı zamanlar...

SOLUCANLARA PIYANO ÇALAN ADAM

SARGUN A. TONT


Keyifli bir bilim yolculuğu
sizi bekliyor...



CepteBilim dizisi ilk dört kitabıyla
okurlarıyla buluşuyor...



www.ginkobilim.com



Celîlê Celîl ê
kurdolog jî yek
ji kedkarên vê
têkoşinê ye. Bi
jiyana xwe ya têr
û tije serdanpê
bîrdariyeke
çandê ye. Yek
ji wan kesan e
ku bi danehevî
û kuliyyata xwe
ya dilnizm,
fêmbar û sade
lê zeraqdar berî
koça xwe ya
dawîn, hêj ku
sax e gihaye raza
nemirtiyê.
Em minetdarên
wî ne...